

WELAT

ejna

biharê, cejna jiyan û azadiyê Newroz dîsa hat.. Dîsa tirs, dîsa şik... Kîn û guman.. Û kelekela xezeba dilê xwînmijan... Gelo wê ev Newroz bi xwîna çend kurdan bê avdan, wê bi hêstirê çend dayîkan birînên vê Newrozê bêne kewandin? Wê di hişê kurdan de çend birînên bêderman werine vekirin? Çend kefen wê bêne dirûtin, wê çend gor bêne vedan?.. Dibe ku yek dilopek xwîn neyê rêtin û ji kesî re xebereke tal neyê gotin... Lê kurd her wê ne bi tirs û saw vê Newrozê jî pîroz bikin? Û heta roj bibe êvar, li ber dahol û zirneyê di govendê de jî, wê di kûrahiya dilê xwe de ne li benda agahiya kuştin û girtinê bin?..

Rûpel 8-9




- ✓ Li derveyî welêt, behsa hebûna PEN'a kurd tê kirin, lê tu his û pis jê dernakeve. MEDENÎ FERHO bi nivîsa xwe bal dikşîne ser wê "Saziyê!" Rûpel 5
- ✓ Di hejmara 7'an de Mehmet Metiner bi sernavê "Dîn, kurdayetî û polîtîka" rexne li hin siyasetvanê kurd dikir. Nivîskarê me û Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê OSMAN ÖZÇELİK di eynî quncikê de bi nivîsa "Qedehek av, dijminatiya dîn û xayîntî" bersiv dayê. Rûpel 13
- ✓ ZANA FARQÎNÎ di nivîsa xwe de ya bi navê "Em ji aliyê Yêlo bûn, lê..." dibêje ku sînema lehengên berê ji wan standiye. Gelo kî bûn ew leheng? Rûpel 16



4

"Dêrsim têk diçê lê kurd û
Kurdistan wê herbijîn"



6

Ji devê dengbêj Şukriyê Xecê
"Salên Xelayê"



10

Aramê Tigran: "Ez kurmancî
ji ermenî xweştir distrêm"

Ji Xwendevan

IRO hînkirina zimanê zikmakî ji bo gelê me pir pêwist e. Ji ber vê yekê ji bo me hemûyan, hînbûn û hînkirina zimanê zikmakî hewcedariyeke civakî ye. Em hemû dizanin xebata ramyari, ku di hemû qadêñ tékoşînê de didome, pir dijwar e. Kesêne pêwistiyen xwe bi cih neynin, wê her tim li dawiyê dimînin.

Hûn jî dizanin ku di hêla ferhengê de gelek kêmeşiyen mezin hene. Ji ber vê yekê, di her hejmarî de nîv rûpel ji bo ferhengokê bê veqetandin wê pir çêtir bibe. Bi vî awayî emê hinek peyvîn nû hîn bibin. Pêşniyazeke min a din jî, di hêla danasîn û nirxandina pirtükîn kurdî de heye.

**MEHMET AZBAY
GIRTİGEHA ERMENEKÊ**

EZ, xwediderketina li ziman, weki xwediderketina li welat û nasnameya neteweyî dibinim. Di van demen paşide, ji bo ku ez hinek hevalen xort teşvik bikim, ez pêşî, rojnameya me distînim, xaçepirsâ bixelat çedikim û disînim (beyî xebera wan). Gava navêwan di kovarê de tê nivîsandin, gelek kîfxweş dibin û êdi ji min pirtir rojnameye dikirin û dixwînin.

**M. BULENT YILDIZ
AMED**

Bawerî û raman

MEHMET GEMSİZ

Ji bo me rojhilatiyan bawerî beriya ramânê tê. Çaxa em qenc, bi ser dîroka xwe de xûz bibin, em dê vê rewşê biblin. Van salen dawî ne tê de, bi giştî bawerî ji ramanê re serdest bû. Cemawer bêhtir li gorî bîr û baweriyen xwe tevdigirîyan, diliyin û dibizivin.

Wesfeke girîng a baweriyê heye. Ew naguhere. Mîna ramanê ne guhîrbar e. Bawerî nolî ramanê natewe. Dişkê. Raman, jê nermtir û guhîrbar e. Mirov bi hêsanî li ser fîkr û ramanê dikarin bi hev re bikevin nîqaşan. Lî ji bo baweriyê, em vê yekê nikarin bibêjin. Mijarîn li ser baweriyê û nîqaşen li serê, zêdetir nazik in.

Bi axaftinîn li ser Kongreya Neteweyî re, mijara olê ji berê germtir ketin rojeva me kurdan. Rast e, gava ku ji yekîtiya neteweyî ya kurdan bê behskirin, dê pîrsa "yekîtiyeke çawa" jî derkeve rastê. Tê zanîn ku gelek rîxistinîn siyâsî yêndan kurdan hene, li parçeyen cihê cihê yêndan Kurdistana.

nê. Her yek xwe bi awayekî bi nav dike.

Li bakurê welêt jî ev serê demekê ye ku, li ser ol û siyasetê tişinan têngotin û nivîsin. Ev yek di nav rûpelên rojnameya me de jî qewimî.

Em jî dixwazin der barê vê mijarê de tişinan bibêjin. Werin em bala xwe bidine bastûra (bunyeya) civaka kurdî. Em dê bibînîn ku çawa ji baweriyen cihê pêk hatîye. Di nav me de, civatênu ku xwediyê baweriyen mezhebîn sünî (şafîî û henîfîtî) hene, alewî hene, heqeyî hene, ezdayî hene, xwedînenas hene û...

Tê dîtin ku civak ji vî aliyî ve çiqas pir-rêng e. Ev çend baweriyen cuda cuda, çawa dikarin bi hev re bijîn? Di demokrasiyeke tekûz de. Bi pergaleke demokratik ew tev dikarin di milen hev de û ji bo eyîn armancê tê bikoşin. Tevgera azadiyê ev yek pêk anîye û nimûneyek e..

Newroz ji bo me kurdan vejîn e, xwe-

guherîn e. Newroz bihara raman û can e. Newroz çirandina kefen û qetandina zîcîran e. Newroz serbestî ye.

Ji aliyê din ve, li ser dîroka Newrozê dîtin û ramanen ji hev cuda hene. Hin ji wan dibêjin ku Newroz cejna kurdan bîtenê ye. Hin jî dibêjin ku, ya gelên Rojhîlata Navîn e. Der barê "Kawayê Hesin-kar" de jî tişinan ku hev nagirin têngotin. Pêwest e ku ev mijar hîn-bêhtir ronî bibe.

Di gel van hemû tiştan, belge û delîlên heyî bêhtir di leha kurdan de ye. Ji bili kurdan, ecem bêhtir nêzîkî Newrozê ne. Lî di çavkaniyê wan de jî Newroz wekî cejneke kurdan tê daxuyandin.

Gelê kevnare yê Rojhîlata Navîn, pir li hev tesîr kirine. Gelek tiş dane hev û ji hev standine. Şîrikatiyeke siruştî (tabîî) di nav wan de çêbûye. İro geleb dab û nîrîten wan muşterek in. Hin ji wan gelan nemane. Ji navê rabûne, çûne.

Ji bo Newrozê, em bi hêsanî dikarin van gotinan bibêjin. Tu gel mîna kurdan ne Newroz pîroz dike, ne li wateya wê xwedî derdikeve û ne jî endamekî/ê tu gelî, agirê wê, bi bedena xwe geş û guriye.

Newroz pîroz bel!

Azadiya gelan

Tirkan di sala 1071'ê de bi alîkariyeke mezin ya kurdan, li hemberî bîzansan şer da meşandin û derbasî Anatoliyê bûn. Di vî şerî de ji 20 hezarî zêdetir kurd hatin kuştin. Dema ku tîrkan xwe di Anatoliyê de bi cih kirin, dest bi dagirkeriyê kirin û jî rewşa gelekî bêcîh û talanker derketin, bûn xwediyê împaratoriyeke.

AMED BOTAN

Hemû mirov û giyanewer ji azadiyê hez dîkin. Lî belê, wekî mirov zindiyê zêdetir biaqlî e, ji azadiyê jî, ew ji zindiyê din zêdetir hez dike. Dema ku insaniyetî teze xuliqiye, mirov hem zêdetir azad bûye û hem jî, ji bo azadiyê pir şer kiriye. Her kesê ji bo azadiyê li hemberî neheqiyê şer kiriye û jiyana xwe di şer de daye, şehîd e; şehîdketin mirina herî bi rûmet û qîmet e.

Di dîroka hemû gelan de ji bo azadiyê, têkoşîn û berxwedan heye. Hinek gelan bi berxwedaneke biçûk azadiya xwe bi dest xistine, hinekan jî yêndan mezin dane. Kes û gelên azad in jî divîtim hişyar bin ji bo ku azad bijîn.

Gelê di dîroka xwe de şerîn dagirkeriyê meşandine û azadî ji mîletan standine, roj hatîye azadiya xwe jî winda kiriye. Ji salen hezarî (pişî zayînê) bi şûn de, gelê ku em jê re dibêjin tîr, mîletekî biçûk û cihê wî yê lê bisekine û bijî tune bû. Jiyana wî li ser pişta heyanan bû û bi talana hebûnên gelên din debara xwe dikir. Roj hat, tîrkan êdî nikaribûn bi wî awayî jî bijîn, gelê Çînê lê xist, ji herêma Asyaya Navîn kir der.

Lî belê ew mîletekî jîr bû û ji bo ku bijî li ber xwe da. Ne tenê ji bo ku bijî, her wiha jî, ji bo ku bibe dagirker xwe bi quwet kir. Di salen 1060'an de di ser Iranê re derbas bûn hatin Melazgirê û li wir kurd xapandin, xwe bi wan kırın hêz. Daxwaziya wan ew bû ku derbasî Anatoliyê bin û li wê derê dagirkeriyê bimeşinîn.

Di sala 1071'ê de bi alîkariyeke mezin ya kurdan, li hemberî bîzansan şer da meşandin û derbasî Anatoliyê bûn. Di vî şerî de ji 20 hezarî zêdetir kurd hatin kuştin. Dema ku tîrkan xwe di Anatoliyê de bi cih kirin, dest bi dagirkeriyê kirin û dîroka xwe ji nû ve nivîsandin. Ji rewşa gelekî bêcîh, bêwîr û talanker derketin, bûn xwediyê împaratoriyeke. Bûn quwetek ji quwetîn mezin li cihâne û ji Romayê bigire heta bi Viyanyê, ji Belgrad heta bi Moldoviyâ çûn û gelên di van herêman de dijîn, bindest kirin, azadiya wan ji wan standin.

Wekî tu quwet tim nikare dagirker bimîne, mîleten ku tîrkan (osmaniyan) bindest kiribûn careke din rabûn ser xwe û azadiya xwe ji tîrkan standin.

Lî belê, gelê kurd hê jî xwe azad nekiriye û hê zêdetir jî, ne tenê di bin

zor û zîlma dagirkeriya tîrkan de ye, lê herwiha jî di bin ya ereb û farisan de ye jî. Wekî dagirkeriya osmaniyan, ji tîrkan re nema û roja iro ketine nav tîrza mirin û mayînê, gelê kurd jî wê zêde bindest nemîne. Ji ber ku bûye xwedîyê rîxistinêku rî ji azadiyê re vekirîye. Ger gelê kurd di wextê de bersivê bide daxwaziyê şerî azadiyê, di vê dema gîhiştî de ewê zû bigihiye azadiya xwe.

Derên ku osmaniyan kiribûn bin desten xwe, ji wan yek jî bajarekî molodovan di sînorê Moldovya û Ukraynayê de ye. Navê bajêr Binder e û bi hejmara iro 180 hezar kes tê de dijîn. Di salen 1600'an de ji Rûsyayê bi hezaran mirovîn rûs hatine di bajarê Binder û di bajarê dora wî de, xwe bi cih kiriye. Wan xwestine Komara Otonom xerab bikin û bi xwe re girê bidin. Lî belê 800 hezar gelê Prêdnestrovayê ji bo azadiya xwe şer dike û leşkeren Moldovya ji komara otonom derdixe.

Roja iro ev komara otonam wekî heremeke serbixwe dijî. Bingeha dewletteke serbixwe hatîye danîn. Serokkomar û wezîrê wê, pereyê wê û ala wê heye.

Mirov dema diçê wê herêmê, weki ku biçe dewletteke serbixwe û azad. Çiqas heremeke biçûk be jî, bêhna azadiyê jê diffüre. Mirov li welatê biyanan çiqas azad be jî, ne wekî welatê mirov şîrîn û xweş e. Ji lew re divê mirov beşî her tişti, bibêje "her tişti ji bo azadiya welat û gelê min."

12'È ADARÈ salvegera bûyera taxa Gaziye bi besdariya 30 hezar mirovî şehîden Gaziye hatin bibîranîn. Sala çûyi li Gaziye 22 kes hatibûn kuştin, pir kes jî birîndar bibûn. Di vê bûyerê de polisan raste rast gule li gel reşandibû. Ji bo bibîrîna şehîdan 30 hezar mirov besdarf meş û xwepêşdana ısal bûn. Beşdarlan berê pêşîn gorê şehîden ziyaret kirin. Piş re li Gaziye meşyan di meşê de ev slogan hatin avetin: "Em qatîlen şehîden dixwazin, işkence wehşet e. Bişî biratiya gelan" her wiha alen partîyen ku li Tirkîyeyê qedexe ne di meşê de hebûn. Lî polisan fîcar cesaret nekirin mudaxale bikin.



ROJA 8'ê adarê li Erdemliya Mêrsinê faşistan êrişî ser malen kurdan kirin. Endamê MHP'ê Galip Çetin û çend hevalen wî ji Halil Aslan ku kurdê Agiriyê ye xeracê dixwazin, ew jî nade. Li wê derê Halil Aslan bi kérê birîndar dîkin. Ev bûyer ku intiqalî mehke-meyê dibe, hildidin binçav, Galip Çetin û hevalen wî bi hewlîdanen serokê belediye yê tene berdan, li ber deriyê mehkemeyê pevcûn çêdibe di vê pevcûnê de Galip Çetin birîndar dibe, piş re dimire. Ü afgirên MHP'ê êrişî ser malbatêñ kurdan dîkin û cihêñ karêwan wan dişewitînîn. Tê gotin ku hêzîn faşist ew bûyer ji xwe re kirine hincet da ku kurdan ji vê navçeyê derxin.

NÜÇE

DIK
Wê kî bibêje,
wey li min?

Yekî ji jinekê re got: "Mizgîniya min li te, birayê te bûye muxtar." Jinikê bi her du destan li çokê xwe da û got: "Wey li min! Mala min mîrat bûl..". Ëmizgîni dayî, ku bi ecêbma-yî "Tu dîn û yan tu fêm nakî? Ez dibêjim birayê te bûye muxtarê Gund, tu dibêjî mala min mîrat bû!" dibêje, jinik bi qêrîn û hawar lê vedigerîne: "Xwezi ez dîn bûma, xwezi min fêm nekira! Lî heyhat ku aqilmend û mîr-xasen mala bavê min çûn, yek jî nema!.. Heke ew hebûna, kesî birayê min nedîk murxtar..."

Mehmed Ağar kirin Wezîrê Edaletê, ez nizanim mîzgîni li kë.. Li polîsîn tirk, an li cehşen kurd?.. Ew, Berpir-sê Emniyetê yê Giştî yê berê ye, û di aliye mafêñ mirovan de sûcdarekî bargiran e. Destarê işkenceyê, ku bi hêzaran mirov tê de hêrand, wî digerand. Termêñ keç û xor-tên ciwan ku bêmehkeme hatibûn kuştin, di bin berpir-siya wî de, rîz kirin li nav bajaran.

Ew kurdêñ ku "Babayol"ê dîtine, wê bi kirinê "Anayol"ê jî hîc ecêbmâyî nemînin. Ûez bawer dikim, wê tu kurdekkî ne cehş, hêviya xwe bi başuya vê hikûmetê ve gi-re nede. Baş u xerabêñ wan, ji bo kurdan wekî hev in. Wekî gotina "bi kerê nikare, diçê kurtan", dewletêñ tirk û erek, ku bi kesî nikarin, her berê xwe didine kurdan û li wan dixin. Û wê kurd li çökê xwe jî nedin, ji ber ku muxtar ne "bira"yê wan e.

Lê tirk?.. Tirk, bi taybetî qismek ji rewşenbîr û nivîskarêñ wan li çökêñ xwe di-din û "Edaleta mala bavê (dewleta) me, ma li ser copa Mehmed Ağar, wey li me!.." dibêjin.

R. DILOVAN

Kî nahêle li Başûr aramî çêbe?

Li gorî agahîyan yek ji sedemîn operasyonê dewleta tirk jî xerakirina têkiliya di navbera hêzîn kurd, bi taybetî jî ya di navbera PKK û PDK'ê de ye. Li gorî derdorîn siyasi, dewleta tirk li herêmê ne tenê xurtbûna PKK'ê, her wisa jî aşti û aramîyê naxwaze.

Ev zêdetirî mehekê ye ku dewleta tirk hêzîn xwe li sînorê başûr û li seranserê bakurê Kurdistanê kom dike û amadekariya operasyonê mezin dike. Tê gotin ku dewleta tirk li ser sînor bi dirfîya 285 km'yi hêzîn xwe dicivine. Rojnameger Namik Durukan dide xuyan ku, hêzîn tirk heta kilometroyekî dikevin nava Başûr û derdikevin û bi balefîran hin deran bombebaran dîkin.

Li hemberî wan, PKK jî hin amadekariyan dike. Bi awayê ku Durukan dibêje, ji ber ku hewa ne baş e, hêzîn tirk nikarin operasyonê berfireh bikin, lewma hin êrisen bi sînor pêk tînin. Li bakurê Kurdistanê jî, li ser xeta Dêrsim û Çewlik (Bingöl) û heta bi Lîca Amedê, amadekariyên operasyonan hene. Ev herêm ji aliye dewletê ve, wekî herêma sor hatiye binavîrin.

Tê gotin ku li Çelê (Çukurca), di navbera gerîla û leşkeran de car caran ser derdikeve. Dîsa li gorî agahîyan, li çolterên Agiriyê jî amadekariyên operasyonê hene. Li gorî gotina Durukan, wê hêzîn tirk ji Çelê bikevin nava erdê Başûr û ber bi Kanîmasiyê ve herin. Li aliye din, di navbera rayedarên leşkerî yêñ tirk û PDK û YNK'ê de hevdîtin çedîbin. Dewleta tirk ji hêzîn kurd dixwaze ku, ew jî bi wan re besdarî operasyonê li hemberî PKK'ê bibin. Lî hêzîn kurd vê yekê naxwazin.



Rojnameger Namik Durukan jî balê dîkişine ser helwesta Mesud Barzanî û eşkere dike ku ew li dijî besdarbûna operasyone-ke bi vî rengî ye. Her wiha, ji nûmeren Bi-zûtnewey İslâmî yê Enqereyê Selahadîn diyar dike ku hêzîn kurd operasyoneke bi vî awayî naxwazin.

PKK'ê berî agirbesta li bakurê Kurdistanê, li hemberî PDK'ê jî agirbest ilan kîribû. Hevdîtinê di navbera PKK û PDK'ê de, hê jî dewam dîkin. Her çiqas niha lihevîkirinek pêk nehatibe jî, li gorî gotina Namik Durukan, heke PDK besdarî operasyona dewleta tirk nebe, wê lihevîkirinek çêbe.

Li gorî agahîyan, yek ji sedemîn amadekariya dewleta tirk jî, xerakirina têkiliya hêzîn kurd, bi taybetî jî têkiliyên di navbera PKK û PDK'ê de ye. Li derdorîn siyasi tê gotin ku, dewleta tirk ne tenê li hemberî xurtbûna PKK'ê ye, her wisa jî ew li herêmê aşti û aramîyê naxwaze.

Di destpêka meha adarê de, Wezîrê Neftê yê Iraqî Emîr Muhamed Raşîd, di nav erdê başûrê Kurdistanê re derbas bû û hate Tirkîyeyê; ji bo hevdîtinê li ser ve-kirina boriya neftê. Ev tiş bi destûra PDK'ê çebû. Li gorî ku tê gotin, deina Konseya Ewlehiyê ya Neteweyê Yekgirtî, rî bide ku Iraq di nava 6 mehan de bi buhayê 2 milyar dollarî neftê bifirose, wê 260 milyon dollar jî bibe para hêzîn kurd. Ew jî wê bibe sedema xurtbûna statûya

kurdêñ Başûr. Ji ber ku dewleta tirk vê yekê naxwaze, hewl dide ku kurdan dîsa bixe tora Saddam. Ji bo vê yekê gelek riyan diceribîne. Yek ji wan riyan jî, tehdîta rînedana hêzîn çakûc e.

Wekî din li ser sedemîn operasyonan gelek tiş têne gotin. Wek mînak: Li gorî Namik Durukan, rayedarên tirk texmîn dîkin ku wê agirbest di Newrozê de biqede, qet nebe wê hêzîn gerîla çalaktir bibin, hêzîn tirk dixwazin rî li ber wan bigirin. Li aliye din, Tirkîyeyê ji bo ku karibe boriya neftê biparêze, dixwaze PDK û YNK'ê ber bi xwe ve bikişîne, piş re karê parastina xeta boriyê li Başûr bispêre wan. Amerîka li aliye kî naxwaze reaksiyona Tirkîyeyê bikişîne, lê dîsa jî hin planan digerîne. Ji ber vê yekê, Melîkê Urdînê Huseyîn diçê Londonê bi Serokê YNK'ê Celal Talabanî û nûnerê PDK'ê re hevdîtinan çedîke û qala konferanseke ku hêzîn dijber ên Iraqi bîne ba hev û hilwesandina rejîma Saddam, dike.

Dîsa çapemeniya ewrûpî idia dike ku Melîk Huseyîn dixwaze Iraqî bike sê fedarasyonê ku ji kurd û erek û şîyan pêk tê û piş re di navbera Iraq û Urdînê de konfederasyonê ava bike. Li aliye din, Iran jî li ser Başûr destvala namîne. Her kes der barê kurdan de xwedî plan û tevdîr in, lê jî li bo rîexistinê kurdêñ Başûr ev yek nikare bê gotin.

SAMÎ BERBANG

Serokê Serhildana Dêrsimê Seyîd Riza
dema tê daleqandin bi qîrînî bang dike:

Dêrsim têk diçe lê kurd û Kurdistan wê her bijîn

Seyît Riza dema sêpê (sêdar) dîtin, ji rewşê fêm kir. "Hûnê (me) daleqînin", got û berê xwe da min. "Tu ji Enqereyê hatî ku, min bi dar ve biki?", gote min.

Me li hev nîhîrî. Cara yekemîn bû, ez bi însanekî ku wê bîhata daleqandin re rû bi rû, dihâtim. Bi min keniya.

Dozger jê pîrsî, ka ewê limêj bike anna. Nexwest. Gotina wî ya dawî, me jê pîrsî. "Çil lîra û saeteke min heye. Hûnê bidine kurê min", got.

Mûyê laşê min bûn mîna şûjin. Ev mîrê kal, bi reperek meşîya. Dehfek li cengene da (wî cengeneyî, wê ew daleqanda). Kindir xiste stûyê xwe. Piyê xwe li kursiyê da û infaza xwe pêk anî."

İhsan Sabri Çağlayangil, ji daleqandina Seyîd Riza wiha behs dike di pirtûka xwe ya bi navê "Anılarım" de, angó "bîranen min".

Çağlayangil yek ji Teşkilata Mahsûsayê yê wê demê ye û wî bi destê xwe hâziriya bidarvekirina Seyîd Riza û hevalên wî kiriye. Roja ku wê Atatürk biçûya Elezîz, wê ew roj jî Seyîd Riza bîhata daleqandin. Beriya ku Atatürk bigihîje Elezîz û vê bûyera daleqandinê bibîne, Çağlayangil bi rayeyeke taybet diçe qera-ra daleqandinê ji mehkeçeyê distîne û rojekê zûtir vê daleqandinê pêk tîne.


Seyîd Riza, Serokê Serhildana Dêrsimê

Dêrsima ku di dîrokê de tu car serî netewandiye, içar jî bi serokatiya Seyîd Riza serî hildida. Neheqî û zilmîn ku li wan dihate kîrin, qebûl nedikirin. Ji gotina M. Kemal Atatürk a ku di vekirina parlamentoya Tîrkiyeyê de, ya sala 1936'an anîbû zîmîn, tewra dewleta tîrk eßkere dikir: "Di karê me yê hundîrîn de, heke tiştek gîringîrîn hebe, ew jî, aloziya (meselya) Dêrsimê ye. Ji bo paqîjkîrin û ji-holêrakirina vê kunêra lêmgirtî (çîban) û kewandina birînê, ku ji karê me yê hundîrîn e, ci pêwist be, divê bê kîrin û ji bo vê yekê jî, ji bo standina bîryarêni bi lezû-bez, selahiyetîn berfireh divê ji hikûmete re werin nasîn."

Jî xeynî vê beyanatê, Atatürk projeya qanûnekê jî, ji meclîse re pêşkêş dike û bi piraniya dîgen, ew tê qebûlkîrin. Li gorî vê qanûnê (mîrov di tarîxa neteweyan de kêm car leqayî qanûnêni bi vî rengî di-be), bi navê "Walîtiya Herêma Dêrsimê", teşkilateke idarî tê lidarxîstîn. Kesê ku bibe berpirsê vê teşkilatê, jê re selahiyeta diktatoriyê tê dayîn û bi van qeraran jî, der heqê Dêrsimê de, fermana idamê der-diket.

'Dêrsim' dibe 'Tunç elî'

Bi van selahiyetan General Abdullah Alpdoğan (Çağlayangil di pirtûka xwe de navê vî kesî wekî Hüseyin Abdullah Akdoğan nîvîsiye) ji Dêrsimê re, hem walî,



**Seyîd Riza û alîgîrîn wî, li hemberî şerawestina
artêşa tîrk, dema têne Erzîcanê, têne girtin û di 18'ê
Sermawîza 1937'an de, bi 11 hevalên xwe re tê
bidarvekirin. Ew kurdên ku li dijî serhildanê xebitibûn jî,
mîna Rehber û yêngî wek wî, piştî serhildanê
tevî malbata xwe têne gulebarankirin.**

hem jî kumandan tê tayînîrin. Pêşî li na-venda Elezîz bi navê "Walîtiya Dêrsimê" teşkilatek û heft şubeyîn wê disa li wê derê tê avakîrin. Armanc pelîsandîna tevgera li Dêrsimê ye.

Piştî demekê, wezîfeyeke din, didin General Alpdoğan: Mufetişya Giştî ya Sêyemîn (Üçüncü Umumi Mütettişlik). Herêmîn Mufetişya Giştî ya Sêyemîn jî ev bûn: Wilayetîn Elezîz, Dêrsim û Çepçürê (Bîngolê).

Bi van selahiyetan, dewleta tîrk dest bi qetîama Dêrsimê dike. Di van her sê wîlâyîtîn ku me behs kir de, rîveberiya taybet tê îlankîrin û bi beyannameyekê navê Dêrsimê dîkin "Tunç elî".

Her çiqas serokîn eşîrîn Dêrsimê, li ser van guherînê dawî, civînan çedîkin û li dijî vê yekê derdi Kevin jî, di nav xwe

de yekîtiyekî nikarin çêkin. Ji ber wê, hin eşîr bêtereziya xwe ilan dîkin, hin ji wan jî bi serokatiya Seid Riza û cîgîrîn wî Alîşer û Nûrî Dêrsimî, bîryara ber-xwedanî didin.

Tam di wan deman de, mufrezeyeke leşkerî ya tîrk, bi hinceta berhevîkirina sî-lehan dest bi hereketa leşkerî dîkin û êrîş dîbin ser Eşîra Yûsufan. Dû re jî, ji leşkerîn vê mufrezeyê, çend heb tecawîzi keçîkê dîkin. Piştî vê bûyîrê, kurê serokî wê eşîr Fîndîk jî, êrîş dîbe ser wê mufrezeyê û wan ji herêmî diavêje. Bi vê se-demî li herêma Mazkert serê germ dest pê dike.

Kurê Seyîd Riza, Bra İbrahîm diçe Xozatê û li ser navê bavê xwe bi teşkilata General Alpdoğan re dikeve têkiliyê, da ku vê hereketa leşkerî bi awayekî adî-

lane bimeşînin. Lê di dema vege-re de, li gorî plana ku fermandar (kurmay) Şevket hazîr kiriye, li gundê Deştê, li malekê di xew de, tê qetîkirin.

Li ser qetîkirina kurê xwe, Seyîd Rîza ji Şevket daxwaz dike ku qatîlen kuri wî teslimî wî bikin, lê, ev yek pêk nayê di ser de jî, hêzîn leşkerî yên tîrkan bi tank û topan êrîş dîbin ser Seyîd Riza û eşîrîn alîgîrîn wî. Bi vî awayî ser, weki çîrûskîn agir belav dîbe. Bi germbûna ser, êdî her du alî gelek xesar didine hev û din. Bi taybetî, kesen bêsileh û feşîr ku teslimî tîrkan dîbin, xelata xwe ji tîrkan distînin: Qetîlam.

Kurmê darê ne ji darê be...

Gotineke gelek di cih de heye, di nav kurdan de: "Kurmê darê ne ji darê be, danarize." Bi rastî jî, kurd ji ber kurmê xwe yên ji xwe, her ku serî li dijî zîlm û neheqiyê rakirine, têk çûne.

Di Serhildana Dêrsimê de jî, birazîye Seyîd Riza Rehber, mohra xwe li binê xayıntiyeke bi vî rengî daye.

Seyîd Riza, bi armansa ku êdî xwîn nerije, dixwaze Alîşer -teorîsyen û têk-şerî Serhildana Dêrsimê- bişîne İran û Iraqê, da ku ji rewşa Dêrsimê, hikûmet Fransa û İngiltereyê agahdar bike. Lî berî bi rojekê, ku Alîşer derkeve derve, Rehber bi 8 hevalên xwe ve diçe ziyaretî wî. Dema Alîşer ji wan re hâzîriya xwarînî dike, Rehber berikan (gûle) li wî di-reşîne û ew lehengê bêhempa li wê derî şehîd dikeve. Jina Alîşer Zerîfe Xanim, dema vê yekê dibîne, demançeya xwe dîksîne û bi guleyekê Vankli Efendi dîxî erdê. Lî belê Rehber xayıntiya xwe dîbîta dawiyê û wê jî dikuje. Dû re serê her duyan jê dike û dîbe ji generalê xwe Al-pî dogan re.

Dînyayê tevde ne didit, ne jî dibîhist

Ji ber nehazîriyê û xayînîn ji nav kurdan, ev serhildan jî li ber têkçûyinê ye û dewleta tîrk, bi qetîameke nedîftî, dixwaze gelê Dêrsimê qir bike. Bi sedan jî û zarok, kal û pîr, keç û xort di vê qetîame de can didin. Nûrî Dêrsimî di 11'ê Rezbera (İlona) 1937'an de ji bo agahdarkîrîna dewletê din ên dînyayê, ji sînorê Tîrkiyeyê derdi keve derve. Ji bo protestokîrina zîlm û neheqîya dewleta tîrk, ji kon-solosxaneyîn Amerîka, İngîlistan, Fransa û hwd. re şikayetnameyeke nîvîski dîşîne. Lî belê dînyayê tev de çav û guhê-xwe girtibûn ji qetîama Dêrsimê re û alîkarî an jî bersiv nedabûn wan.

Ev tişt baş tê zanîn ku, piştî bûyerekî însan bi kîrinê xwe dikevine dîrokê. Mi-na Seyîd Riza, Nûrî Dêrsimî, Alîşer Zerîfe û hwd. dîbin lehengê birûmî, mîna Rehber û kesen wek wî jî, dîbin xayînîn di dîrokê de.

Du pîremêrdêñ kamil

Du mirov, du kesên çilekêş

û du kesên aştîxwaz.

Her wiha du mirovên

gihîştî: Yaşar Kemal û

A. Melik Fırat.

her du jî, ji ber

aştîxwaziya xwe têñ

darizandin.

Ma dewlet bavê min e. Dinya alem hemû dibêje gerîla. Ew gerîla ne, ez çima nebêjim gerîla?"

Yaşar Kemal bi van gotinêñ xwe helwesta xwe ya li hemberî birtyara dadgehê eşkere dikir. Roman-nivîsê navdar, bi salek û heşt mehan hate cezakirin. Cezayê wî jî, hate tecîlkin; jî bo pênc salan. Li ser vê yekê jî Kemal wiha dibêje: "Yanê nenivîse. Ev ji işkenceya çînê xerabtir e. Ezê hîn tütjîr binivîsim."

Yaşar Kemal di sala 1922'an de li navçeya Edenê Osmaniye hate dinya-yê. Ew bi xwe ji Muradiyeya Wanê ye û neviyê Qulîxan Beg e. Pişti ku dev ji dibistanê ber dide, li pir cihan dixebe. Nivîskariya Yaşar Kemal bi helbest nivîsandin dest pê dike, helbesten wî di pir kovaren herêmî û di rojnameyan de bi navê Kemal Sadîk Göögcelî hatine weşandin. Piş re hikaye nivîsandin, hîkayaya wî ya yekemîn bi navê 'Sarı Sıca' (Germa Tavê) bû. Di sala 1957'an de dest bi roman nivîsandin dike, romana wî ya yekemîn "Teneke" ye, piş re "Ince Memed", ku ev roman 4 cild in

û bi cilda sisêyan xelat stand. Romanen wî yên ku li ser kurdan, jiyanu kurdî dîne xuyakirin yên herî nas in, ku filmîn wan jî çebûne ev in: Ağrı Dağı Efanesi, (Efsaneyâ Çiyayê Agiriyê), Yer

nîn demokratîk ên Ewrûpayê û yên Tirkîyeyê wergirt. Bû berendamê Xela-ta Nobelê, hin pirtûkên wî li 17 ziman hatine wergerandin, hin jî li 40 zi-manî hatine wergerandin.

genat anî ku êdî tu kurd li hemberî dewletê serê xwe bilind nake, dengê xwe dernaxe.

Dewletê pişti qetilkirina Şêx Seîd malbata wî sirgûni navçeya Enquerê Kırıkkaleye kir, wê gavê A. Melik Fırat du salî bûye. Li vê sirgûniyê ji malbatê şehîdek tê dayîn. Pişti ku vedigerine we-lêt, di sala 1957'an de ji Partiya Demokrat (DP)'ê dibe mebûs. Ji ber ku nameya Seîdê Kurdi dide Adnan Men-deres tê girtin, dibine Yassiadayê, piş re jî dibine Qeyseriyê.

Di darbeya 12'ê adara 1971'an de ji dewlet idia dike ku kurê wî qesta revandina Yılmaz Güney kiriye, ji ber vê yekê tê girtin. Di sala 1981'an de ji dewlet içar bi idayıke din, diçe deriyê wan. Ew bi du kurê xwe ve, bi hinceta ku qesta kuştina serokê MHP'ê ya navçeya Xinisê kirine, têne girtin û wê demê virüsâ Hepatip B'yê jî didinê. Di sala 1983'an de ji dewlet wî tehdît dike ku di partiya MDP'ê de bibe mebûs, lê nabe. Di 1987'an de dibe mebûsê DYP'ê, ew û 33 mebûsên kurd ji bo ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin xebatê dikan. Ji ber vê, jê re tehdît têñ û pişti van tehdîtan, ji DYP'ê istifa dike.

Dewletê disa ew, bi hinceta ku iti-râf-karek li serê ifade daye, di 12'ê reşemiyê 1996'an de girt. Fırat di 8'ê adarê de hate tehliyekirin. Aştiya ku A. Melik Fırat ji gelên kurd û tirk re dixwest, li xweşîya dewletê neçûbû û bi hinek idayıen pûc girtibûn. Doza ku lê hatiye vekirin, hê jî dom dike. Eynî roj Yaşar Kemal hate cezakirin û A. Melik Fırat jî tehliye bû.

Deh hezar zarokê min di hundir da-ne, ma ezê çawa derkevin ji girtîgehê? Ev jî gotinêñ Abdulmelik Fırat in. Li Tirkîyeyê tiştinan sosret diqewiinin. Mirovinen xuyanî, kal û sembola aşî û biratiyê jî, têne hepiskirin; digel nexwesbûna wan. Belê neviyê Şêx Seîd Abdulmelik Fırat jî ji vê rewşê para xwe standibû.

A. Melik Fırat, ji du saliya xwe û vir de li hemberî dewletê li ber xwe dide. Dewletê bi qetilkirina Şêx Seîd wisa

METİN AKSOY



Demir Gök Bakır (Erd hesin esman sifir) cihekî girîng di edebiyeta tirkî de digirin.

Di sala 1980'an de li Fransayê xela-ta navneteweyî ya Del Duca stand. Yaşar Kemal ji ber çalakiyên xwe yên navneteweyî, di warê edebiyat û kultûrê de disa li Fransayê nîşaneyâ Légion d'Honneur stand. Bi romana xwe ya Demirciler Çarşısı Cinayeti (Cinayeta Sûka Hesinkaran) jî xelata romana Ma-darali stand. Bi sedan xelat jî ji rîexisti-

Ewrûpayê li şopa navnîşana PEN'a kurdî digerin. Ev kluba winda û ne diyarı nivîskarêñ kurd, gelo çiqas dibe saziyeke kurdî? Xuya ye ku ev saziya bi navê kurdan hatiye damezirandin, hewceyiya têkiliyê bi nivîskarêñ kurd re nabîne. Demeke berê ev sazî bû dabaşa nivîsaran, di rojnameyan de jî. Bersiva van nivîsaran ne ji teref berdevk û berpirsiyâren beşê kurdî ve hatiye dayîn. Ji teref serokê gişî bi awazeke xerbende hate dayîn.

Bi rastî dema min ew nivîsara lêgerîn û dozkirina mafêñ nivîskarêñ kurd xwend, kêfa min hat, lê dema bersiv ji teref serokê gişî hat, dilê min qermîci. Ji ber ku bersiv ne di warê mafêñ nivîskarêñ kurd de, bifer-moyî ya wan bû. Berevajî bifer moyî ya nivîskarêñ kurd, domandina di reşê de û girtina riya endamtiya PEN'a kurdî bû. Wilo tê gihiştîm ku PEN'a kurdî, bes ji bo çend kesan hatiye damezirandin û tu maf ji bo nivîskarêñ kurd bi gişî tune ye. Diyar e ku PEN kluba kurdî li pirsgirêka nivîskarêñ kurd û di bin zordestiyê de ne, hewceyiya dengderxistinê nabîne. Yan, ew deng dikin, em nabîhîzin. Alahûalem...

Ku min şaş fêm kiribe û naveroka wê bersivê ne wilo be, ji kerema xwe re hinek min agahdar bikin.

Em tev dizanin ku tevgera civatêñ xelkê êdî ketine ser milê saziyêñ neteweyî.

Komên xelkê û gelan bi komeleyan, bi sazî û avahiyêñ çandî di warê dewletî de xwe pêş de dibin û di nava konêñ xelkê de bi rûmet cihê xwe digirin. Ew qas berdêlén giran ku li Kurdistanê hatine dayîn jî, ji bo wilo ye.

Ne belaş û vala ev berdêl hatine dayîn û hê jî têne dayîn. Helbet, ji mafê her mirovê kurd e ku di civata kurdan de, bi ramanê xwe, bi azadiya ramanê xwe cihê xwe bigire. Lê, ev nayê wê maneyê ku kes, cih û warê neteweyî, bi bazirganî di bin bandora xwe de xilmek bike. Ew kes, dikarin desten xwe dirêjî bazirganiyê bikin. Hingî ne ez û ne kesekî û nikare zimandirêjiyan li dehma wan bike.

Ez, kesî tawanbar nakim. Lî ez, li wî mafî ku min bi ked û xwidana xwe bi dest xistiye digirim. Ne mafê tu kesî ye ku riya bidestxista mafê min bigire.

Banga xwe dubare dikim. Neşter li derdê kurdan yê kuşinde ketiye. Hewl bidin û tevgera yekîtiya kurdan ne bes di hêla rêxistinan de, di hêla sazî û dezgehê neteweyî de jî pêk bînin. Ev bar li ser milê rewşenbîr û nivîskarêñ kurd e. Nivîskar bêhtir ji her kesî û berî her kesî, pêwîst e ku cihê xwe di nava guhertina civata kurd de bi gişî bigirin û aqilmendiya avakirina nûjen bikin. PEN kluba filan kes û bêvan kes jî, di nav de.

Ez li mafê xwe digerim

MEDENÎ FERHO



Ev ne nivîseke hêvîkirinê yel.... Nivîsareke daxwaz û xwestina maf e.. Ev daxwaz ji xilmetkirinê (zilliyet) nayê. Ji mafê dadî tê, yanî daxwaza mafê 'mukteseb' e..

Daxwaz du: Ez li wî kesî digerim ku dikaribe bersiva min bide... Ne ji rêzê be. Berpirsiyârê wê saziyê be. Ji bo ku karibe bersivê bide.. Ne daxwaza min bi tenê ye, pir nivîskarêñ kurd ku xwe di hêla nivîskariyê de dane qebûlkirin û xwedî berhem in, bendeyî dengekî ne. Ew deng yê xêrê be, yê şer be ne gişî e... Bes ku dengek ji vê hêlê bê û em zanibin rewş di kîjan qonaxê de ye. Berpirsiyâr, serok kî ye? Navnîşan, telefona vê saziya ku nebûye neteweyî ci ye? Çima nebe saziyeke kurdî ya neteweyî? Gelo ew vî maşî di xwe de nabînin, an hinekîn din, rî û rîcîk li pêşîya wan girtine? Min divê fêrî hinek tîstan bibim. Ji mafê min e ku hinek bersiva min bidin.. Dabaşa min li ser PEN'ê yel..

PEN'a kurd ango Kluba Nivîskarêñ Kurd. Mîna Diyojen, ro li nîvro fanos di destê nivîskarêñ kurd de ye, li kolanêñ bajarêñ

Ji devê dengbêj Şikriyê Xecê

salên xelayê

**Tiştê balkêş ew e ku,
gundê Êrkendê ev cara
duyemîn e ku vala û wêran
dibe. 55–60 sal berê ji
gund nesîbê xwe ji
bûyereke pir mezin û
dramatîk distîne.**

**Ji ber ku "salên xelayê"
wekî gelek herêmîn
Kurdistanê li vî gundi jî
bandoreke xurt kiriye û wê
demê jî gund vala bûye.**

Eirkend; gundekî Perwariyê ye ku li ser bajarê Sêrtê ye. Gund beriya 2–3 salan ji 200 malan pêk dihat. Heta ku di sala 1993'an de were şewitandin û wêrankirin, gund li Herêma Garisan mîna Kela Berxwedanê dihate binavkirin.

Wekî bi hezaran gundê Kurdistanê, gundê Êrkendê jî, li dijî sîstema cerdevanîyê û xwîmrijandina birayê xwe derdikeye û dev ji erdêb bay û kalêne xwe berdidin, li metropolên Tirkîyeyê û bajarê Kurdistanê belav didin. Ji 200 malan Êrkendê nêzîkî 150 mal iro li bajarê Edeneyê, li taxên Şakîrpaşa, Hürriyet, Anadolu, 19 Mayıs'ê dijin. Ew malbatê din jî, li Mêrsin, Dîlîük(Entep), Nisêbin, Cizîr û Sêrtê bi cih bûne. Ew bi xwe li van deveran ketine statûyên penaberan. Hem ji aliyê aborî û hem jî, ji aliyê siyâsi ve di rewseke xerab de ne.

Em jî, li Edeneyê rastî civateke rîspiyan gundê Êrkendê û derdora wê bûn. Rîspiyan bi navê Şikriyê Xecê, Hecî Mistefayê Temel, Ehmedê Silêman, Mihemedê Sadîn, Mele Ehmedê Mahmela û Resûlê Isa diyar dikin ku iro li girtigehan 60–70 girtî, ji 100'i zêdetir şervan û 40 jî şehîden wan hene.

Ji nav rîspiyan, ji ber ku dengbêj e jî, me xwest em bi Şikriyê Xecê re sohbetek bikin. Tiştê balkêş ew e ku, gundê Êrkendê ev cara duyemîn e ku vala û wêran dibe. 55–60 sal berê jî, gund nesîbê xwe ji bûyereke pir mezin û dramatîk distîne. Ji ber ku "salên xelayê" wekî gelek herêmîn Kurdistanê li vî gundi jî bandoreke xurt kiriye û wê demê jî gund vala bûye.

Werin em, ji devê Şikriyê Xecê, ji rewşa wê demê heta iro ci qewimîne hîn bibin...



Şikriyê Xecê (li aliyê rastê) û rîspiyan ji herêma Garisan

Mamê Şikri! Beriya her tiştî em dixwazîn em we, ji devê we hîn bibin. Kî ye Şikriyê Xecê?

— Belê. Ez di sala 1941'an de didema "sala xelayê" de li gundê Êrkenda Perwariya Sêrtê hatime dinê. Malbata me ji Eşîra Garisan, ji mala "Babetan" e.

We got sala xelayê, ji kerema xwe re hûn dikarin behsa wê demê û rewşa civakê bikin?..

— Wê çaxê Şerê Duyemîn ê Cîhanê dest pê kiribû. Di nav dewleta Ûris û Almanyayê de şerekî gelekî dijwar diqewimî. Wê demê, dewleta tirk, ji ber ku erzak ji Almanya re bi rî dikir û ew erzak jî, ji dehl û deviyê Kurdistanê bûn, tiştê ku dihate çandin, dewleta romî dest datanî serê; ji bo rîkirina Almanyayê. Ji ber vê yekê jî, di nav me de birçibûn, qitlix, nexweşiyêngiran dest pêkir, wekî gurîti, xur û hwd. Ji sedemîn van yekan jî, na-vân wan salan bû "salên xelayê"

Gelo piştî wan bûyêren ne xweş û dijwar, di nav we de vegetandin û qoçberiya ji axa bay û bapîran dest pê kir anna?

— Belê, belê! Wê çaxê ne tenê herêma Garisan û Botan, piraniya Kurdistanê di bin vê tesîra xelayê de man. Gundê me Êrkendê bi xwe, bêkemahî 100 mal hebû wê demê. Lî piştî vê xelayê, 93 mal bar kir, bi tenê 7 mal di gund de man. Piraniya wan kesen ku koç bûn, derbasî binxetê bûn. Em çûn sixulandin. 30 km, riya Sêrt û Perwariyê, ìme bi xweydana eniya xwe çêkir.

Zaxo, Telehfâr, Qamişlo, Amûdê, Mehmegirê, Çiyayê Şengalê nav êzîdiyan. Ji ber ku li wan herêman erzanî hebû, xela tune bû, rez û pez, dehl û devî, nan û av zehf bû.

Ev koçberiya we ya binxetê, çend sal dom kir û li dijî vê yekê dewleta tirk bi nêrînekê çawa li we mîze dikir? Ji bo vegera we qet hewldana wan hebû gelo?

— Em li benketê 3 sal man. Piştî 3 salan, dewleta tirk bang li dewletê Sûriye û Iraqê kir, ji bo ku em dîsa vegerin serxetê. Dewletê got: "Werin emê we têr bikin, emê iş û kar bidine we." Me jî bawer kir, em hatin. Lî dewletê wê çaxê jî, li me xiyanet kir, ji paş ve li me xist. Xortê me tev girtin û şandin leşke-

**Di sala 1993'an de,
gund hate şewi-
tandin. Wê demê
300 hawan top
avêtin nava gund.
Dotira rojê jî, dig-
otin "Terorîstan ev
yek kirine, pişt re jî
we ew hewandine."
Bi mehan li ser bê-
deran bi me
ışkence dikirin.**

riyê. Hinek ji me xistin heps û zîndanan, dest danîn ser mal û milkên me. Dewletê ev yek ne tenê bi serê xwe dikir. Wê, alîkarî ji şex, axa û began stand. Pişt re jî, ji me "vîrgiya serane" (serê mirovîkî/ê 15 banqinot) dixwestin. Lî pereyê tu kesî tune bû, 15 banqinot jî ne pereyek biçûk bû. Wê çaxê jî, ji me re digotin: "Nexwe rahêjim tevr û berên xwe, riyan çêkin." Bi mehan ji serê sibê heta êvarê me dane

sixulandin. 30 km, riya Sêrt û Perwariyê, ìme bi xweydana eniya xwe çêkir.

Piştî ku dewlet hûn ji başûrê rojava ber bi Bakur ve anîn, ji we kes li wê de-re man? Heger mabin, di navbera we û

wan de tu damûstandin çedibûn?

— Belê man. Heta vê saetê jî pisma-mîn me, xalet û metikênen me li wê derê hene. Li wê derê zewicîne. Wê çaxê hînek kesan zarokêñ xwe yên 5–6 salî ji bo nanekî difirotin. Heta 40–50 salan hev û din nedidîtin. Beriya 7–8 salan jînek bi navê Leylêyâ xwişka Hecî Xelîlê Talî piştî 40 salan hate gundê me, cem birayê xwe Hecî Xelîl.

Pişt re hûn diyar dikin ku piştî wan xizanî, rebenî, pest û kotekîyan rewşa we, ber bi basiyê ve diçe. Bostan û zeviyê we şîn dibin. Hûn dibin xwedî berx û beran. Vê rewşê çawa dest pê kir û heta kengê dom kir?

— Me bi salan giya xwarin, berû û kereng xwarin. Lî piştî 9–10 salan rewşa me, wekî we jî got, piçek be jî, ber bi basiyê ve çû. Li Diyarbekir û Sêrtê em çûn şixul, me heywan meywan peyda kirin, me ew xwedî kirin. Lî wê demê jî nêdihiştin em bi rehetî gepek nan bixwin. Axa û began, her dem dibûn maniyê nanênen me. Beg û axa, şirîkên qereqolan bûn. Dibûn yek, dest datanî ser pezîn me. Me, ne hêk ne mirîş dixwarin. Me dianî didan axa, beg û zabitîn qereqolan.

Mamo! Em werin ser rewşa iro. Hûn li metropolan belav bûne, rewşa gundê we û derdorêne we çawa ne?

— Gundê me Êrkend jî 200 malê pêk dihat. Di sala 1993'an de, gund hate şewitandin. Wê demê 300 hawan top avêtin nava gund. Dotira rojê jî, digotin "Terorîstan ev yek kirine, pişt re jî we ew hewandine." Bi mehan li ser bêderan bi me ışkence dikirin. Iro jî li derdorê, gund nemane. Iro jî hûn dibînin, em di vê derê de derketine.

SALIHÊ KEVIRBIR



● 21 Adarê 1990

Zekiye Alkan li navenda Amedê ji bo protestokirina zilma li hemberî kurdan di cejna Newrozê de xwe şewitand. Mazlum Doğan jî li girtîgeha Amedê bi pêxistina çar darikên niftîkê Newrozê pîroz dike, pişt re xwe dixeniqîne. Rahşan Demirel jî li şzmirê di 1992'an de xwe şewitañd.. Û di Newroza 1994'an de jî li Almanyayê du keçen kurd Ronahî û Bêrivanê xwe şewitandin.

● 21 Adarê

Di dîrokê de li hemberî zilmê serhilidana pêşîn (B.Z) di 612'an de kurdan bi serokatiya Kawa li hemberî zilma Ason, serî

hildan. Ew roj hem wekî cejna kurdan, hem jî wekî sersala kurdan hatîye qebûkirin.

● 21 Adara 1937'

Destpêka Serhildana Dêrsimê. Roja 21'ê adarê gelên Dêrsimê pira Kahmûdê şewitandin û êriş ser qereqola sînê kirin. Ev bûyer wekî destpêka Serhildana Seyîd Riza û Dêrsimê tê qebûkirin.

● 20 Adarê 1994

Serokê komîteya piştigriya Kurdistanê Theofilos Georgiadis ji alyê du êrişkaran ve li Lefkoşeyê hate kuştin. ERNK'ê wekî berpîrsê kuştina Theofilos MİT'a Tirkîyê nîşan da .

AWIR

Wê rojê

Kulîkîn Kurdistanê roja Newrozê serê xwe ji nav axa germ tînin der û rûyê rojê dibînin. Av wê rojê xwe degihîne guliyêne daran, teyr û waş wê rojê ji germîyanan dizivirin warê xwe. Berx û karikêne sava wê rojê dibin mîvanê heliza şîn. Bayê Newrozê zîpêne zarokan dizivirine û mîzgîniya biharê dide wan.

Qulîgîn koçer wê rojê xîmê hêlîn xwe diavêjin, pezê kovî roja Newrozê xwe dîkişîne bilindahiyan û li azadiyê digere. Avê ber keviya wê rojê digihîn nav robaran, birûsk Newrozê vedigeşin, ewrîn reş û tarî wê rojê belav dibin li ber dengê wan. Beleka hî wê rojê dikeve çiyayê Kurdistanê. Ararat wê rojê dest dide kar û bârê xwe, Sîpan roja Newrozê serê xwe li nav mij û moranê tîne der û silavê dide Gerava (Gola) Wanê.

Ew roj, roja Munzûrê kovandar e, vê rojê Erez dilbixem, Zê dîn, Dîcle û Ferat evîndar in. Stêr wê rojê geş dibin û dicilvilin di hindava Deşta Heranê de, li ser Çiyayê Nemrûd roja Newrozê xweş e dîtina rojê, roj di Newrozê de dikeve birca beranan û berê xwe dide havînê.

Newroz roja hevdîtina aşiq û meşûqên kurd e., şal û şepikên botanî wê rojê têne liberxwekirin, xencerên deban di Newrozê de dikevin ber şallîn kermansahî; gerîyen cemedaniya wê rojê xwar dibin ser gulakêne xurtan. Dilber di Newrozê de belbiya têxin bet biskîn xelek, xizêm wê rojê sor dibin ser lîvîn zerî esmeran, ke meren zîvîn wê rojê li navtengê zîrav têne alandin, lawê serbîxîlî, keçen destbîhene di Newrozê de diçin

geşta û seyranan.

Qralê kurdên Gotî Zarmûx û giregirên wî, 4336 salan berî niha li ser xêr û bereketa çandina salê, roja Newrozê ji Xwedayê mezin Mardûx re spasî kirin. Hikumdarê kurdên Kasît û herî navdar Cemşid, 3892 sal berî me, di Newrozê de gîhîste Babilê. Bavê 17 şehîdan, Kawayê Hinavsoûti wê rojê çû ba Deheqê Xwînmêj dadîti jê xwest. Dema ku berbankê (bersing) xwe yê hesinkariyê yê kavîl li serê rimê xwe alandî û stranên azadiyê di got û di kolanên Nînovayê de li pêşîya gel dimeşıya.

Ew roj jî careke din Newroz bû. Ferîdûn wê rojê şûrê xwe ji kalanî kişand û tola bav û kalên xwe vekir û zîndanên Nînova wê rojê li ser serê Deheqê zulmker hilweşîya û wêran bû. Xanê Mukî Kela Dimdimê û Birca Narîn, ji bo wê rojê da avakîrin. Dengbêjîn behdînan di Newrozê de kom dibin li ser Sûlava Amêdiyê. Şeqlava wê rojê dibe bûka herêma Soran. Cîndiyê botan wê rojê agir hilkîrin rex Birca Belek. Şîrnekê roja Newrozê bersiv da Egîd û hevalen wî, Mehabad û Qada Çarçirayê wê rojê ji feleka xayîn rojek borand. Bi hezaran şehîdîn Helebçeyê çend rojan beriya Newrozê ketin ser axa sar û cemidî. Di Newrozê de birîndan bûn Wan û Sason, Dêrsim û Zîlan. Keçen nûgi-hîşî li ser kela Izmir û Amedê wê rojê xwe avêtin nav agîrî, xwe kirin qurban.

Wê rojê xweş e gerîna li çiya û gelîyê Laleşê, Nowroz e roja Gaziyê, tolhîdanê, hawar û meş e.

IHSAN CULEMERGÎ

ÇAVDÊRÎ



DILBİXWÎN DARA

Dema ku min sorik ji ser Helepçe rakir

Jî nişkî ve Janeke giran kete serê min. Hêdî hêdî xwe avête nava dilê min û wekî ku tu bîrekê bikolî newaleke kûr di nava hinavê min de vekir. Ez wekî gîjekî avêtime ser rûyê zemînê. Wekî korekî ku di dilê wî de dîtina çelengiyê bibe hesret, wekî laşekî ku nikaribe navê welatê xwe bibêje, ez wekî biyan û koçerekî ku nikaribe konekî jî ji xwe re bike stargeh.. dest û lingê min hatine girêdan.

Li vir ezê vê carê jî xwendevanan lêborîne bixwazim, ji ber ku hinek caran ev pênuşa di nava tiliyên min de nikare yan jî naxwaze her demê pêşîra gotinan eşkere veke. Ev ne di dest min de ye, dema ku jan dikeve dilê min, qeleta ku ev çend sal in rihet nebûye, wekî gurekî xwe di nava çavên bêdengiyê de lêdixe. Biborîn, ez ji we re vê nameya ku li ser van hêstîrên di çavên min de hatine nîvîsandin, di vê rojê de nikarim bixwînim. Dilê min naxwaze. Dixwazim her tişti eşkere bibêjim. Ne hûn xwe biwestînin, ne jî ez. Dixwazim dilê xwe ji we re vekim, hûn jî serbest in, heya dawiya jiyan xwe li ser wê xeyalê avjeniyê bikin, xwe netîrsînin, ez nahêlim hûn di nava wê xeyalê de bifetisin, aman.. bila fetisandin neyê bîra min.. bila ez wê kefa zer li ser lîvîn zarokên xwe nebînim, bila çavên min li wê xwîna reş nekeve.. li ber xwe bidin û çîroka fetisandin jî bîr nekin.. Belkî ez ji çîrokê bi dûr ketim, lê belê, ez çîqas jê bi dûr bikevin jî, ewqas nîzîk dibim.

Di vê rojê de ez hatime kuştin. Min bi van çavên xwe yên kor mirin dît. Ev ne cara yekemîn bû, gelek caran ez hatibûme kuştin, lê belê ev kuştin ne wekî hemû kuştinê din bû. Ji nişkî ve ez girtim, haya min ji bûyereke wisa tune bû. Nedîhate bîra min jî, tu caran min bawer nedîkir ku eze rojekî ji rojan werim kuştin. Tu caran min bawer nedîkir ku wê qertelîn reş goşte min bixwin û hestiyê min biavêjine rûyê însanan.. ! Ez ne mirovîkî wisa bûm ku qertel goştên min bixwin û însan jî hestiyê min bikujin. Dema ku min çavên xwe yên kor vekirin, mirineke reş konê xwe vegirtibû, û însan dixwarin. Wê demê hemû dest li ber mirinê hatine girêdan, her kesê ji mirinê re tobe dikir, nedîhate bîra kesekî ku xwe ber ijiyanê bikişîne.. Wê demê navê berxwedanê li min kirin. Û min li ber xwe da. Tenê daxwaza min ew bû ku stûna wî konê reş bîşkînim. Ew rojîn mirinê tu caran ji bîra min naçin. Kuştina her kesekî kuştina min bû jî. Ji bo min her canek însanek bû, her însanek canek bû. Reş, spî, sor... Her kes, ji ber ku di dilê her mirovîkî de dilek heye, di çavê her kesî de ronahiye heye û ji ber ku her canek, di sînga ezmanan de stêrkeke jiyanî ye.

Gelo, ez mirovîkî dîn bûm, hişen min ne li serî min bûn? Li ser cenazeyê her kesî giriym, bi dayîkan re li ber dîwaran min şîn gerand, bi bavan re min eniya xwe qermîçand, bi zarokan re min devê xwe yê bicûk xiste çîçik û pêşîren dayîkan, bi keçan re destê min hatine henekîrin, bi bûkan re ez xîstime bin sorikan û bi zaveyan re ez derketime serbanê xaniyan û min şekîrîn di nava kaxetan de belav kirin.. Çî hate ser min, min kî kuştibû... Dilekî min hebû, min ew jî kire xelat. Rihekî min hebû, her kesî ew ji xwe re dibir, niha ji her kes min dikuje û ji vexwarina xwîna min têr nebin. Min dixwin û diranên xwe ji goşte min bi sungîyan paqî dikin.

Rojekî ez însan bûm. Min ji her kesî hez dikir. Li pêşîya çavên min dînya bîbû gulistanek. Keviran jî xwe wekî gul û nêrgîzan xemîlandibûn. Her tişti şîrîn û ciwan bû. Di çavan de hêvî dihatine dîtin, di dilan de evîn hebû û te li ser pişta kesekî kul nedîditin. Niha...

Li çepê xwe dinêrim zarokekî devê xwe xistiye pêşîra dayika xwe û jehrî dimije. Li rastê xwe dinêrim, kalek li ser gopalê xwe hîşk bûye, destê li jor in, diyar e ku wî ji Xwedê hawar dixwest.. li pêşîya xwe dinêrim.. çavên min kor bibin, keç û xortekî lêv zirav xwe avêtine hembêza hev, xwestine ji ber mirinê birevin, lê çare nedîtine û rûyê xortê simbel tenik di bin porê keçikê de hatine vesartin. Li pişt xwe vedigerim, dikevime nava tayekê, xwêdaneke sar, min dide ber xwe, canê min dilerize û wekî ku tu rihe min bi kérân ji nava canê min derxîn, eze çi bibêjim?! Di devê zarokekî pênc salî de pariye nanê hîşk dibînim. Di çavên wî de gelek tişt hatine nîvîsandin, te ji Şerefnameyê mezintir dîrokek di çavên wî zarokî de didit. Li aliyekekî birçîbûn, li aliyekekî sêwîbûn, li aliyekekî jî mirin.. Çîrokekî dirêj e, kesek nizane çawa dest pê kir, wê çawa biqede. Hîna navê çîrokê jî nehatiye nîvîsandin.



Newroz cejna jiyam û mirinê

Kurd gelekî kevnare yê Rojhilata Navîn e.
Hemdemê gelên wekî hîtît, sumer û yên din e.
Her wiha xwediyê zehf adetên kevn e ji. Îro tu gel
mîna kurdan Newrozê pîroz nake û lê ji xwedî
dernakeve. Agirê wê bi ten û gewdeyên xwe gur
kirine. Newroz Newroza kurdan e, ji ku hatibe,
çawa dest pê kiribe ji. Ecem bi xwe ji di çavkaniyêñ
xwe de navê "îda kurdi" lê kirine. Hevalê me
RAHMÎ BATUR bi şêweya xwe ya taybet li ser
Newroza îsal sekînî.

Li her welatê cîhanê, hemû milet li gorî adet û toreya xwe, beriya ku cejn bê, bi çend rojan hâzırıya xwe û wê rojê dîkin; mala xwe dixemîlinin, ji xwe û zarokên xwe re cil û bergên nû dikirin, xwarin û vexwarinêñ herî baş amade dîkin.

Hele wê rojê, ji şahiya zarakan re tu pîvan tune ye, her daxwazeke wan ji aliye mezinan ve tê qebûlkirin.

Werhasilê kelam; cejn, şahî û şenî ye...

Lê ji bo kurdan?

Ji bo kurdan cejn ne şenî, şînî ye... Roja mirinê, roja xatirxwestinê ye... Di nêzîkahîya cejnê de, ne ji kîf û seyranê re, kurd xwe ji mirinê re, bi kefenê spî dixemîlinin, lê ax, ku gelek caran kefen ji bi destê wan nakeve; bêkefen, bêgor û bênav diçin... Bêhawar... Ji bo şîn û giriye ji kes li dû wan namîne;

Wekî Helepçe...

**Cejna biharê,
cejna jiyam û azadiyê
Newroz dîsa hat..**

Dîsa tirs, dîsa şik... Kîn û guman... Ü kelekela xezeba dilê xwînmijan... Gelo wê ev Newroz bi xwîna çend kurdan bê avdan, wê bi hêstirê çend dayîkan birînê vê Newrozê bêne kewandin? Wê di hişê kurdan de çend birînê bêderman werine vekirin? Çend kefen wê bên dirûtin, wê çend gor bêne veden?...

Dibe ku yek dilopek xwîn neyê rêtin û ji kesî re xebereke tal neyê gotin... Lê kurd her wê ne bi tirs û saw vê Newrozê ji pîroz bikin? Ü heta roj bibe êvar, li ber dahol û zirneyê di govendê de ji, wê di kûrahiya dilê xwe de ne li benda agahîya kuştin û girtinê bin?...


**Newroz hebe ji
agir tune ye**

Dewlet ji aliyeke ve, li Sîrtê, li navçeya Dihê (Eruh) tekelêñ erebeyan di-

hejmêre, hejmarêñ tekelan tesbit dike ku di Newrozê de kes agir hilneke, Newrozê pîroz neke. Ji aliyeke ve ji, êdi naxwaze Newrozê ji kurdan re bihêle, ew bi xwe ji lê xwedî derdikeve. Ji bo roja Newrozê "Milli Piyango" amade kiriye û li gorî agahiyan, roja Newrozê wê her derê bi renğen kesk û sor û zer bixemîlinin. Yanê heta niha wekî kurdan; Newroz ji tune bû, vêga heye, lê ne ya kurdan e... Jixwe ji mîj ve, bi profesorekî xwe kitêbek bi navê "Ergeñekon Bayramı Nevruz" (Cejna Ergenekonê Newroz) ji, dabûne nivîsandin. Navê nivîskarê wê, vê gavê ne di bîra min de ye, lê di wê kitêbê de dihate gotin ku Newroz di nav tîrkan de, ji mîj ve wekî cejna biharê tê pîrozkirin û ev cejn, cejna tîrkan e...

Yanê Newroz hebe ji, agir tune ye... Jixwe hûn ji, baş dizanin ku roj heye, tav tune ye, lê kurdan tavê ji bo fesadiyê û bi taybeti ji, ji bo parçekirina wekkat ku yekpare ye û nayê parçekirin, (dev ji parçekirinê berdin, nayê derzandin ji), derxistin e...

Wekî ku tê zanîn, dewletê hinek kitêbên ku di nav gel de bi navê "Kitêbên kart-kürt" tên naskirin ji, dane nivîsandin û di van kitêban de ji, tê gotin ku kurd tîrkîn çiyayî ne, lê ji ber ku li



Mazlum Doğan

Di Newroza 1982'an de bû destpêker

çîyan, di meşa li ser berfa qurşe de, dema piyê wan di berfa hişk de diçe û dengê "kart-kürt" derketiye, navê wan "kurt" danîn e...

Here mîro, ku tu neçî...

Ku min bizamîya zebanîyêndadgeha ewlekariya dewletê naxeyidin, minî ev pîrs bikira:

Gelo dewlet, ji bo ci ev çend tîbûyê xwîna biharê ye?.. Ji biharê bêhînteng e? Ji biharê re bi kîn û xezeb e?.. Ma biharê bavê wê kuştiye?

Ku, ji bo biharê ne yek, ji xwe re du cejn pejirandine, lê her du cejn ji qede-



Pemâre Zekiye Alkan li Shêmaniye. Zelîne Newroza 1990'ı de xwe li Amalê şewitand.

Xe kiriye û di her du cejnan de jî, xwînê dirêjîne:

1'ê Gulanê û Newroz...

Diyar e, ku koka neyartiya wan û bîharê gelek kûr çûye, ev doz wisa bi cejnekê, diduyan safi nabe... Em ci bîkin? Navberîtiya me jî qebûl nahe, nexwe însaneti nemiribû, me yê ew li hev bianîna lê... Dev jê berdê! Me ci ji neyartiya wan?

Tenê ev e ku ez pê aciz dibim: Ci-ma spasiyeke bêqîmet jî nadine me kurdan, ku ev çend sal û zeman e, wan dev ji cejna xwê berdabû. Me pîroz dikir, li serê xwîna xwe rêt û heta iro pa-



Bedriye Taş (Ronahi)



Nilgün Yıldırım (Bêrîvan)

Herdu yan jî di Newroza 1994'an de, li Almanyayê xwe şewitandin.

rast û anî... Nexwe ez jî dizanim ku Newroz, bi navê Xwedê (haşa) cejna rehmetiyê (cehimî) Ergenekon bi xwe ye! Em tenê doza spasiya parastina Newroza wan dîkin!.. Û hew... Lî, xûya ye ku zêde nankor in ev sebab, wê spasiyeke bêqîmet jî nedine me...

Newroz

Cejna Newrozê ne tenê kurd, gelek mîletên Rojhilata Navîn jî roja Newrozê (Nûroz, Nûroj) wekî cejna azadiyê, şikestina zilmê û destpêka bihar û jiyanê pîroz dîkin: Kurd, afgan, belûcî, fars, tacik, ossed û hwd.

Li gorî riwayetê, hikiindarekî zâlim ê bi navê Dehaq hebû ye, ku ji ber zilm û zora wî, wekî Şedad tê bibîranîn. Di kitêba Şerefhanê Bidlîsî Şerefnameyê de jî, ji şairekî kevn, ev rist hatine nivî-

sandin: "Qederê xwestîye ku erdêne heft demsalan / Ji Dehaqê xwedî qerekterê Şedad re serî bitewîne."

Û rojek ji rojan êşa pençesêrê li Dehaq dikeve, li ser her du milêne wî, di rengê du maran de, du kunêr derdikevin. Çiqas hekîm û loqmanênu ku hene têne serê, lê dermanê êşa wî peyda na-kîn. Di dawiyê de yek ji wan dibêje ku, dermanê vê êşê mejiyê (mex) xor-tan... Pişti ku serê du xortan jê dîkin û mejiyê wan di her du kunêren reng-

marîn didin û êşa Dehaq hinek datîne, êdî her roj, serê du xortan jê dîkin û mejiyê wan di kunêran didin... Pişti demekê amirê ku serê xortan jê dike, tê rehmê, rojê xortekî azad dike û di cihê mejiyê xortekî de, her roj serê berxike-kê jê dike, mejiyê berxikê di kunêren Dehaq dide. Û amirê dilovan, her xortekî ku azad dike, jê re dibêje:

"Ji gund û bajaran derkeve, here se-re çiyan ku Dehaq pê nehese."

Kawa

Bi vî awayî, li çiyan gelek xort kom dibin û di dawiyê de, di bin serokatiya Kawayê Hesinkar de êrîş dibin ser sa-raya Dehaq, serê Dehaq jê dîkin û gelên Nînovayê ji bin zilma Dehaq azad dîkin. Kawa dema dikeve saraya Dehaq û serê wî jê dike, bi agirekî ges û bilind mîzgîniya mirina Dehaq û mîz-gîniya azadiyê dide gel. Ev roja azadiyê bi navê rojeke nû, bi navê destpêka jiyanê, Newroz (Nûroz, Nûroj) hatiye binavkirin.

Lê li gorî hinek lêkolîneran jî, Newroz ne bi vê rojê dest pê kiriye. Newroz cejneke bêtir kevnare ye û kurdan roja serhildana xwe bi zanebûn rasti cejna Newrozê anîne.

Newroz, çendî di roja 21'ê adarê de tê pîrozkirin jî, di kovara "JIN"ê de du nivîskarêne kurd ên bi navê Kurdiyê Bidlîsî (Xelil Xeyalî) û Memdûh Selîm di sala 1919'an de di nivîseke bi ser-navê "Kawe İhtilalî (İhtilala Kawe)" de roja vê bûyerê wekî 31'ê tîrmehê didine nîşan û vê rojê ne bi navê Newroz, bi "Cejna Kurdan ya Kaweyê Neteweyî" nîşan didin. Û 21'ê adarê jî wekî sersal hatiye nîşandan. Lî ev rast be jî, Newroz ji aliye gel ve di 21'ê adarê de tê pîroz kirin û êdî cih girtiye, li gorî me êdî kes nikare vê biguherîne.



Rahsan Demirel

Li Izmirê di Newroza 1992'an de xwe şewitand.

✓ Cejna Newrozê
ne tenê kurd, gelek
mîletên Rojhilata Navîn jî
roja Newrozê (Nûroz,
Nûroj) wekî cejna azadiyê,
şikestina zilmê û
destpêka bihar û jiyanê
pîroz dîkin: Kurd,
afgan, belûcî, fars, tacik,
osse û hwd.

✓ Newroz, çendî di roja
21'ê adarê de tê pîrozkirin
jî, di kovara "JIN"ê de
du nivîskarêne kurd ên
bi navê Kurdiyê Bidlîsî
(Xelil Xeyalî) û
Memdûh Selîm di sala
1919'an de di nivîseke bi
ser-navê "Kawe İhtilalî
(İhtilala Kawe)" de roja vê
bûyerê wekî 31'ê tîrmehê
didine nîşan û vê rojê ne
bi navê Newroz, bi
"Cejna Kurdan ya Kaweyê
Neteweyî" nîşan didin.
Û 21'ê adarê jî wekî
sersal hatiye nîşandan.

Aramê Tîgran di nav kurdan de mezin bû, adet û kultura wan hilgirt, ji wê yekê jî dibêje:

'Ez kurmancî ji ermenî xweştir distrêm'

Aramê Tîgran dibêje:
"Ez bi kurmancî ji zimanê ermenî xweştir distrêm."
Sebeba vê jî wiha nîşan dide: "Bavê min Tîgran Melîkiyan wisa kir ku ziman û hunera kurdî di ruhê min de şîn bibe. Ew her tim bi diya min re bi kurdî dipeyivî. Ji sibehê heyâ evarê bi kurdî klam digotin."

Aramê Tîgran, di sala 1934'an de li başûrê rojavayê welêt (Kurdistana Sûri), li bajarê Qamîşloyê hatiye dinyayê. Bi eslê xwe ermen e. Malbata Tîgran di salên 1930'ı de ji bâkur, koç Sûri kirin. Di sala 1966'an de li Ermenîstanê, Êrivanê bi cih dîbin.

Aramê Tîgran, di sala 1958'an de dest bi hunerê kir, ew bingeha hunera xwe, folklora kurdî nîşan dide. Pişî bi demekê di Radyoya Êrivanê de xebitî, bi kurdî program pêşkêş kirin. Vê xebatê 18 salan dom kir.

Bi çar zimanân stran

Aramê Tîgran dibêje: "Ji zarokatiya min ve hunera min li ser hozanên kurdî

û ermenî hebû, min gelekî ji wan hez dikir û min dixwest her demê stranan bi kurdî bibêjim."

Bi çar zimanân distrîne: Kurdî, erekî, ermenî û yewnanî. Ew dibêje: "Bêhtir stranê kurdî û erekî li xweşîya min têr. Stranê bi wan zimanân gelekî şêrîn in."

Kurd û ermenî bi sedsalan di nav hev de jiyane. Jiyana wan a civakî û kulturî tesîr li hev kiriye. Aram di nav kurdan de mezin bû. Ew dibêje: "Min tore, adet, ehlaq, orf û kultura kurdan hilgirtiye. Bavê min i ku gelekî girîngî dida hunerê, alîkariyeke mezin di vi warî de ji min re kir."

Cîranê me

Alîkarê wî yê hunerê bavê wî bû. Ew bîranîneke xwe wiha tîne zimen: "Bavê min tim û tim ji min re digot: 'Kurê min ez ji Tirkîyeyê hatim û bûm cîranê kurdan. Rabûn û rûniştina me, orf û adetên me tev bûne yek, klam û stranê me jî nêzîkî hev in.' Bi kurtasî digot, gava te dest bi klam û stranê kir divê tu kurdî ji bîr neki."

Aram ji bo têkiliyên kurd û ermenîyan wiha dipeyive:

"Ji bo ku biratiya kurdan û ermenîyan were xirabkirin, dagîrkeran roleke mezin lîstine. Di dîrokê de her du gel mîna bira bi hev re jîne, gelekî alîkariya hev kirine û ji hev re bûne piş. Ji bo ev biratî xurt bibe, gerek e ev her du gel



bi hev re bimeşin. Xurtkirina vê têkiliyê wezifeya me tevan e."

'Bi kurmancî xweştir distrêm'

Aramê Tîgran dibêje: "Ez bi kurmancî ji zimanê ermenî xweştir distrêm." Sebeba vê jî wiha nîşan dide: "Bavê min Tîgran Melîkiyan wisa kir ku ziman û hunera kurdî di ruhê min de şîn bibe. Ew her tim bi diya min re bi kurdî dipeyivî. Ji sibehê heyâ evarê bi kurdî klam digotin. Pir helbest jî bi kurdî çekirin."

Di salên 80'yî de li Êrivanê rojekê xanîma Aram diçe sükê. Di rê de jîneke kurd wê disekinîne. Jê dipirse: "Aram kurd, tu

Aramê Tîgran:
Gerek e kurd û ermenî bi hev re bimeşin.
Xurtkirina vê têkiliyê wezifeya me tevan e.

ermenî, we çawa hevdû girt?" Xanîma wî dikene û ber-siv dide: "Xwişa min bi xwedê em her du jî ermenî ne." Jinik lê vedigerfine: "Ez bawer nakim ku Aram ermenî be." "Çima?" Jinik jê re dibêje: "Ji ber ku Aram wisa bi ruh û can klamên kurdî dibêje, tu kes bawer nake ku ew ermenî ye."

'Ne hewceyî makyajê ye'

Aramê Tîgran, ji hunermendêni ciwan jî vê dixwaze: "Ez hêvî dikim ku hunermendêni me gava klaman dibêjin, ruhê kurdî, xweşikbûna wê ya kurdî xerab nekin. Bila zehf makyajan nekin, meqamên kurdî çawan in bila wisa bêngotin. Hunera me pir zengin e, ne pêwist e em bixin bin bandora biyanan."

Aramê Tîgran ji bo şervanên azadiya Kurdistanê jî gelek stran çekirine. Ew dibêje: "Di dema şoresh û têkoşînê de huner dikare wezifeyeke pir mezin hilde ser milen xwe." Ew vê wezifeya xwe bi stranê Mazlum, Egid, Firat û Newroz tîne cih.

A. ARAM



Di vê heftiyê de li Navenda Çanda Mezopotamyayê çalakîyên çand û hûnerê wekî konser, pêşangehê wêneyan û ahaftinê li ser çand û hûnerê hene. Her wiha vê heftiyê wê filmê belgehî yê li ser Yılmaz Güney were pêşkîrin.

● 17.3.1996 - Şemî

Demjimêr 14.00 Şanoya MKM'ê Jiyana Nû/ Rojbaş.
Demjimêr 18.00 Konser Gülbahar.

● 20.3.1996 - Çarşem

Pêşangeha Kevneşopî ya Newroza 96'an

Wêne Fevzi Bilge, Süleyman Danışman
Peyker (Heykel), Türkkan Akkulakoç.

● 22.3.1996 - În

Demjimêr 18.00 Konsera Tûmer Avcı

● 23.3.1996 - Şemî

Demjimêr 12.00 Belgefîlma Yılmaz Güney û
axaftvan Ahmet Soner, Şanar Yurdatapan
Demjimêr 16.00 Konsera Ahmet Kaya

RÛDAN

Serokatiya peyvan



SÎRWAN REHİM

TÎŞK



Yekêtî Rojnamenûsanî Kurdistan

Dospêkî şitekan debê dan bewe da binêyin ke, rojnamey kurdî le ser destî mîrxasanî biwarî rojnamenûsanî, gûrkî way be xowê bînîwe ke, gelî kurd be pîroziyewe temâsay rojnamey kurdî biken û laperekanî be singewê binûsênen û be çeşnî rojname rûzerdekan neyken be xwan (sifre), yan le şitûmekî nealênin. Herwesa roşînbîran le erşîvî taybet da bîparêzin û çawî rîzî têbibrin. Diyare, em gûre lebar û ew rewse pîrsîngdarey ke, bizavî rojnamenûsanî pêgeyiştîwe, le xora û besêkevit niye.

Belkû le ser destî rojnamenûse be emek û canfidakanî kurdewe berceste kirawe. Ewaney mamexemey peyiv, merekeb, lapere bûn û destiyan le malbatî xo berdawe û êşikyan be diyar teqeteqî çapxanewe girtuwe. Aşkiraye ke le seretay em karwanewe, serqafleçî wekû: Mîqdad Mîthed, Pîremêrd, Mûsa Anter, Salih Yusîfî, Şakîr Fetah, Huseyin Çelebî, Ferhad Tepe, Ersê, Aysel Malkaç û şehîde nemirekanî tirman hen, ke debê û pêwîste bew perî hurmet û giranbehayewe seryan bo danewênen.

Emro rojnamenûsanî Kurdistan wekû pêwîstiyekî giftûgo newîste, hewcedarî yekêtî xoyanî, nek her wextî hatuve, belkû direngîse. Belam, aya lem rojane de, ke kongirey damezrandinî yekêtî nawbiraw'le şarî Köln be encam geyîş, tiwanra zorîney rojnamenûsanî Kurdistan le amêz bigîrêt? Bêgûman nexêr. Be çawpoşîn le yek diwanê beşdaranî tir hemû le bakûrî Kurdistan bûn. Başe bo debê le yekem hengawewe, yekêtî rojnamenûsan rû be rûy rewşekî weha bikrîtewe û be qelemî hemû zarawê corbe corekanman ew mîrge nexemlînîrêt? Be boçûnî min giriftakan çend giriftekir, le serûy hemûş yanewe, giriftî ziman rîgirêkî gewreye. Zorîney ew bira delalaney ke lem kongireye da beşdar bûne, be zimanî tirkî qiseyan kirduwel! Be daxewe serbarî ewan ke rengbê hendêkiyan biyanûy ewe bihêninewe (Kürte olara kendimi ifade edemiyor) Serokî PKDW, berêz Yaşar Kayaş, be tirkî qisey kirduve. Diyare hez û hurmetî ême baranber be mîmosta Yaşar kaseyekî lêwawlîwe û xwanexwaste xebatî berêzyan ci le biwarî rojnamenûsi û ci le biwarî siyâşî da kem nakeynewe, belam be boçûn û ramanî min qisekirdinî Serokî Perleman, le civînî awa fermî û firawan da, be tirkî şitîkî xerîbe.

Be herhal, ême wekû sedan carî tir hêvidarîn ke, birader û hevale roşînbîrekanî bakurman, dést le berokî zimanî tirkî berden. Lewra tenha rîyek xalî yekgirtineweman bêt û bimangeyenê malî mebest, zimanî neteweyî xoman e. Debêt kes be çawî xwar û xêçwe têyernwanêt, dena tûşî be tûş heldêrî fire sextewe dê.

Be hîmîy ew rojek ke tarmayî zimanî tirkî le serman derewêtewê û be zimanî xoman deaxivîn, denûsin û xewdebînîn.

Wêray serfirazî bo Yekiyet Rojnamenûsanî Kurdistan.

i gorî dem û mercan ji bêje û peyvan hinek bi qasî ewrênhî biharê tîjî dibin, di devê bindestan de dibin hêvî, dibin bombe, dibin qîrîn û ken. Li layê din ew peyv çiqas bêñ bilêvkirin, ewqas ji zordar û dagirkaran re dibin tirs, xewê li wan diherimîn. Dîsa her peyvek bi kedeke mezîn, bi herikandina xwînê dixemile.

Her çiqas ji wan peyvan hinek di pêvajoya dîrokê de car caran bi pêş ketibin jî, tu car bi qasî iro ew peyv ji çanda me re nebûbûn serok. Minak: "Azadî, çiya, şer, bindestî, welatparêzî, zordesî, serifhildan, pakrewanî, aşîti, biratî, serxwebûn, fêdekarî..."

Belê, carinan yek peyv pir tiş e, pir bi wate ye û giranbuha ye, bi nirx e. Ev gotinê J. Paul Sartre jî vê baş ronî dike: "Ê ku cemaweran digihîne azadiyê, ne bi tenê çanda teknîkî ye, her wiha yek peyv jî çand e. Çanda layiqî gelan jî ev e. Tişteku hatibe jîbîrkirin, wê bi bîr tîne. Lew re tu kes di şûna me de naponije." (1)

Mamoste İsmail Beşîkçi jî girîngîya mercan wiha bi lêv dike: "Mirov dikare hinek bêjeyan li gorî mercen rojane bi wateyan dağire." (2)

Ta çend salêñ çûyî mirovan bigota "çiya" bilindî, sar û serma, zozan, mêsîn, ba û berf bi wê peyvî re di hişê me kurdan de şewl di- dan. Iro dema mirov dibêje "çiya" rengê çî-

rokê diguhere; serfirazî, azadî, serbilindî, qehremantî û fedekarî tê bîra mirov, ewqas ji tîna di dilê mirov de sor dîbe.

Seydayê mezîn Cegerxwîn di helbesta xwe ya bi navê "Direvîm" de bedewiya wê peyvî wiha rave kiriye: "Hevalê hêja megîrî, çiya cihê şera ne/ Dîvarê rûmetê ji serê mîran e."

Wan peyv û gotinan di gelek nivîsan de cihê xwe baş girtine, pir bi wate ne: "Zanebûna neteweyî mîna tovekê di hişan de tê çandin û gelê me rastiya xwe baş nas dike." (3) Wê her tim hinek peyv di gel têkoşinan bi pêş bikevin, çand û toreyê bixemîlinin. Ku mirov wan peyvan di dilê xwe de veşêre û di hişê xwe de girê bide, wê hişê mirov pûc bikin û di dilê mirov de bikin kul.

Em dîsa guh bidin banga J. Paul Sartre: "Ku nivîskar di warê wêjeyê de be, azadiya ku di cîhanê de tim di talûkeyê de ye, divê azadiyê bi lêv bike û peywira banga azadiyê hilde ser milê xwe.. nivîskarê/a ku neketibe vî warî tawanbar e." (4)

Çavkanî

1-4: Denemeler, J. Paul Sartre, Soy yay.

Çevirenler: Sebahattin Eyûboğlu, Vedat Gülö, Şubat 1994 sayfa: 62-31

2: Tunceli Kanunu (1935) ve Dersim

Jenosidi, İsmail Beşîkçi, önsöz.

3: Özgür Halk, 15 Kasım 1995, S.60

CİHAN ROJ

Ji deftera Mizgînê

M

izgîn Dîmen ev zargotin dan me.
Ew ji heşt mehiya xwe pê ve li Stenbolê
dijî û zimanê xwe ji bîr nekiriye.
Her wiha bi çanda xwe jî radibe.
Ew ji gundê Kurika Mêrdînê ye û
xwişk û birayekî wê jî heye.

Pîrê û dîk

Pîrê danê xwe dişfûst. Danî ser xêni. Dîk çû nikulek lê xist. Pîrê kevirek li dîk xist, çavê dîk derxist. Dîk ket rê û çû. Xelkê jê re got, "Dîko." Got: "Ji min re nebêjin dîko, bibêjin Dîkil Axa." Gotin: "Dîkil Axa tuyê herî ku?"

Got: "Ezê herim dû eskerê giran. Bînim ser pîra dudiran. Çavê min derxistiyi ji bo libik dan."

Henê û Bermotko

Henê û Bermotko çûn çolê. Li şivanekî rast hatin. Gotin: "Ho şivan!" Şivan got, "Hê." Gotin: "Sê komik ax li ber deriyê me ne. Komika navê mifta me tê de ye. Ü şiva me li ser êgir e. Ü nanê me di tûr de ye. Daleqandî û tu nerî rex wî ha." Şivan got: "Na na." Piştî ku ew çûn, şivan çû mifta wan derxist. Nanê wan û şiva wan xwar. Hestî xist tûr û ew daleqand. Ü di beroşê de gû kir û çû. Henê û Bermotko hatin malê. Li şiva xwe nêrin ku bûye pe'lûl û nanê wan bûye hestî.

Bermotko got: "Henê Henê!... Mişk li ser bêvila te heye." Got kixk û ew jê kir. Çiroka min ji we re xweş, ka telosik zebeş.

Kundê serê şêrê

Got cih û warê bavê min lê. Pîrê, hundir rês kir. Seriyek çortan dît danî ser piyê tiftek. Got ew der cêwî bû. Mîrîşkê nikulek lê xist, got "Ji bênevsi bû." Pîrê şonikek lê xist, tirek kir, got "Ji çemtaqetî bû."

Pîrê heft werîs li pişta xwe girê da, got: "Ji weynekî bû."

Mamik

Hanîka manîka
Ferşê dara kanîka
Rê neda aşvanîka.

(qeşem)

Tenûra himhimî
Tije nanê genimî.

(hingiv)

Ho dibêjim
Tevşo dibêjim
Bi nav dikim
Û nabêjim.

(tevşo)

Şikeftik reş
Tije mîhê bes.

(dev û diran)

Himzekê
Pişta xwe venekê.

(melkes)

Lem lemo
Li ber çemo.

(aş)

Simê gê
Tije xwê.

(hinar)

Pîra qermîçî
Darik di qûmê de.

(mewij)

Kundirê daleqandî
Cava lê beliqandî.

(pîreka bihemil)

Hilindir milindir
Law ji bavê bilintir.

(agir û dûxan)

Sor sorko
Erdê dikolko.

(dilop)

Tıştek mast
Li deştek rast.

(hêyyv)

Şivik ter
Li gûher.

(mar)

Qalikê kûsî
Heft tebeq e.

(pîvaz)

Dîzika daniya
Li ser xaniya.

(stêrik)

Bizina kember
Xwe da hember.

(kêç)

Berhevok

Ez vê dirêsim

Yek dirêsim

Pelûlkê çedikim

Dialêsim

Hewara min, pismamê min
Romîka girtiye dora min.

Dermanê dil

Şekr û şema

Li ber çema

Çem çiqçiqî

Av tê nema

Ez zîwana

Nav genima

Tu fincana

Dest hakima

Poçkê bi dû

Bi erdê çû

Heta tu çû

Aqlê min çû.

Yek dido

Bahwer sisê

Çeqla fisê

Mamo dîno

Kevrê şîno

Qesra Elî

Çardeh derî

Yek jê teter

Yek jî meter

Heya sibehê

Allah û ekber.

Lo pismamo

Tu pismamê min î heq î

Tu dismala dorbideq î

Ez te nakim

Hek tu biteqî.

Lawê mala guhcemidî

Giyayê çola me seridî

Te ez nanîm

Te yek din dî.

Gurî gurî qaqa

Ser dara simaqâ

Çûye ba xatûnê

Tif kir devê qûnê

Ji bo qalibek sabûnê.

Çiq û çiq

Çeqmaqê çik

Çiya miya görmemîşim

Ew kî bû li nav baxcana?

Baxcana şax berdane

Şimdi qader boyledir

Bilmiyorum ismî nedîr.

Hejmartin

Yekê yekanokê
Çepilxana xana gijo
Dosta inê ser miştinê
Heba tirî vingir virî
Çanguçeyî qûlqûleyî
Barûteyî bîst li te yî

Yek û yek
Teyrikê belek
Zaza bilbil

Go êvara we bi zirilê

Eyn û xeyr û zirçelê

Go cilkî deyn û rapelê

Ez nehatim rapela we

Ez hatim çingilvilgî

We leplepûkî me

Hatiye Emê

Jê re çeqlafiskî çêkin.

Hop hopê

Qere topê

Deva mala mîra

Li ku diçêri?

Li qeleç

Çi dixwî?

Nan û goşt

Çi dirî?

Safî herî.

Çivanok

Tacê tu ci top tacî

Tû gindirî min tû xwar

Gû gindirî min tu xwar.

Heft baq derzî

Derzî bi derzî

Di qulka derzî

Di ya min de bezî.

Kurm qurîn qul kir.


Kerê boz

Di rîzdê de zirya.

Tir û tîvir di kevçî de

Min tîvir xwar

Tir ma di cî de.



DU XONÇE Jİ BAXÇEYÊ HELBESTA KURDÎ

Di nav weşanê Avesta de du pirtükên helbestê derketin. Ji van pirtûkan yek jê ya Reşidê Kurd e ku li bakurê Kurdistanê nayê nasîn. Yek jî pirtûka Şîrén Windabûyi yên Cegerxwîn in. Weşanxaneya Avesta, bi weşandina van pirtûkan du nîrxên hêja yên toreya kurdî derxistine ronahiyê.

Şâirekî kurd, lê ne Kurdistanî

Helbestvanê kurd Reşidê Kurd, bi esle xwe ji Dêrika Mêrdinê ye, lê ji ber zilma komara tirk çû-
y e

binxetê, li wir bûye endamê Partiya Komünîst a Sûri. Di pirtûka ku bi navê "EZ" hatiye weşandin de helbesta yeke-mîn a bi navê 'Basen Bêrûdê' bi şewe-ya xwe gelekî balkêş e. Di pirtûkê de ji bîlî vê helbestê hemû helbest bi pîvana kîteyan û li ser serê çînayetiye yê li Sûriyeyê hatiye nivîsandin. Bi taybetî helbesta bi navê **Kerwan** "Serpêhatiya Sûriyê di deh salan de: 1949-1959" tîne zimên. Di nava pirtûkê de bi giştî careke tenê navê Kurdistanê derbas di-be, li wir jî mebest bakurê Kurdistanê ye. Dîsa di nava çend helbestan

de kurd derbas di-be, lê doza nete-weya kurd di helbestan de nîn e. Ci dera ku lê welat û mîlet derbas bibe, mebest jê mîlet û welatê Sûriyeyê ye. Heke mirov Reşidê Kurd di çarçoveya vê pirtûkê de binixîne, ew kurd e, lê ne kurdistanî ye. Ew çiqas doza kurditi-yê neke jî, ji ber ku helbestan xwe bi kurdî nivîsandine, di nava to-reya kurdî de cih digire. Her wiha bi helbesta

"Basen Bêrûdê" di helbesta kurdî di pêşketineke dîrokî pêk anîye. Divê bê gotin ku di hin helbestan de jî ceriban-dinê bi vî rengî hene.

Kurdistaneke sosyalîst

Dema mirov helbestan Cegerxwîn û yên Reşidê Kurd dide ber hev, di warê şewe-ya nivîsandinê de gelekî dişibin hev, lê ji aliye naverokê ve cuda ne, ji ber ku ji helbestan Cegerxwîn bêhna Kurdistanê difûre. Cegerxwîn jî doza sosyalîzmê dike, pirtûk bi vê helbestê dest pê dike:

"...Kurdistana ez dixwazim: Tê de parti bî serok/ Lawê karker serkomar bî, lawê cotyar bî wezîr/ Nahêlim sermayedar çêkin hêlinê kapîtal/ Çunkî Kurdistanâ sosyalîst e min her dem di bîr..." lê xweş xuya ye ku ew doza Kurdishaneke sosyalîst dike. Di pirtûka Cegerxwîn de helbesta li ser kuştina Seîd Elçi û helbesta bi navê 'Miletek... Şüresek... Zilamek' ji aliye naverokê ve gelekî balkêş in. Helbesta bi navê "Wayîf li heyvî daniye" ku wî wergarandiye kurdî, bi cihêrengiye xwe dêh-na mirov dikişîne.

SAMI TAN

Navnîşana xwestinê: Weşanen Avesta Asmali Mescit sk. 35/37 Şahînhan No: 211 Beyoğlu İstanbul Tel-faks: 251 71 39

BIŞENG ANIK

Xwişka Bişenêk pir delal e Kulîlka li hêla Botan e Pir şêrîn û nûciwanî Sembola keçen kurdan î

Xwişka Bişeng şehîda me Sembola serhildana me Kulîlka li nav baxê me Tim bûka welatê me

Lê kirin işkence û lêdan Wê digot bijî berxwedan Girtiye reça Mazlum Doğan Her dem tuyê bijî li dilê kurdan

Bişeng Anik di Newroza 1992'an de li Botanê li bajarê Şîrnexê li hemberî lêdan û işkenceya hovan li ber xwê da. Ew bi destê dijminê hov hate şehîdkirin.

*Li ernalê hevalên wê
Talat Dayan*

Qedehek av, dijminatiya dîn û xayîntî

OSMAN ÖZÇELİK



Ev çend meh in ku navekî jî me re nû, di qada welatparêziye de peyde bû. Bi hezaran welatparêz hene ku me navê wan nebihîstiye. Dibe ku ev kes gelek bi nav û deng bû, lê belê ji cehaletiya xwe min ew nas nedikir.

Di rojnameya "Demokrasi" de nivîsên wî hatin weşandin. Ji nivîsên wî min fêm kir ku, kurdekî oldar e, her çiqas kurdayetteya xwe bi awayekî fediyok dianî zimên jî, min digot qey wekî her kesî ew jî dizanîn ku ev dewleta bêwîjandan, jiyanê li kurdên ku xwedîtiyê li nasnameya xwe dikin teng dike. Divê mirov xwe piçekî bipolarê..

Min pîrsa wî kir. Ew ji partiya Refahê veqetiyabû û kurtedemekê şêwirmendiya Serokê Belediye Stenbolê yê ji Refahê kîribû.

Paşê? Paşê di rojnameya "Azadiya Welat" de bi navê "Dîn, kurdayette û politîka" nivîseke wî hate weşandin, di hejmara 3-9'ê adara 1996'an de. Di vê hejmara de nivîseke min jî hebû. Min ya wî berî nivîsa

xwe xwend.

Ez ci bibînim. Nivîskarê me yê kurd ê îslâmî ne wekî ez difikirîm kurdekî şermok e. Tu nabêjî ew feylezofekî kurdan e. Peyv û gotinê ji barê xwe girantir, dike.

Di 4'ê reşemiya çûyî de, Enstituya Kurdî bi navê "Pirşîrêka Kurd û Riya Çareserkirinê" sempozyûmek pêk anîbû. Li ser navê HADEP'ê jî ez beşdar bûbûm. Akin Birdal, İsmail Nacar, Bahri Zengin û Kemal Baysal û hwd. panelîstên din bûn. Meha Remezanê bû û ez bi fitar bûm. Min pêwîstî nedît ku ez xwe wekî kesen rojîgirtî bidim xuyan. Min qedehek av vexwar, cixareyek kêşa, min ci dizanî ku feylezofe me jî di nav guhdaran de ye. Û yekê nake didu, ewê rabe nivîsa xwe ya yekemîn a di rojnameya Azadiya Welat de li ser vê qede-ha avê binivîsîne û bi behaneyê qedehek av tiştîn negotî ji min re û ji rewşenbîrên kurdan hemûyan re bibêje. Camêr di qedehek av de pêlên zeryayê rakiriye.

Her çiqas wî navê min nedabe jî ez bi qasî wî ne nazik im. Ezê navê wî bidim. Navê wî yê bi xêr; Mehmet Metiner e.

Di sempozyûmê de min gotibû "Rojekê ku ermenî bixwazin vegeerin, dil û hembêza kurdan ji wan re vekiriye. Ji ber ku em dost û cîranêne hevûdu yên dîrokî ne." Me gotibû "Em bawer dikin ku hemû gelên dinê bira

nin." Roja din rojnameya Akşam (Şev) di rûpela yekemîn de û wekî nûcaya yekemîn nivîsi ku, me daxwaza dewleta kurdan û ermenîyan kiriye. Bi vê gotinê, eşkere bûye ku em li ser navê Abdullah Öcalan diaxîvin û têkiliyê ermenîyan û PKK'ê bi vê sempozyûmê careke din jî eşkere bûye(!!)

Min bihîst İsmail Nacar jî giliya min kiriye, li cem serokê giştî yê partiya me. Gotiye: "Hûn çîma mirovên wilo dişînîn civînan. Di meha Remezanê de cixareyan dikêse û piştgiriya filehan dike." İsmail Nacar, şexsiyetekî tê naskirin e. Em dizanin ew ji kê re dixebeitê û ew li dûv ci ye. Rojnameya Akşamê jî wekî navê xwe, tarî ye. Me bersiv neda herdûyan.

Lê belê Mihemedê me wisa ye?

Ma bêbersiv dibe?

Min dixwest nivîsa wî bêkêmasî ji nû ve li vir binivîsanda. Mixabin cih teng e. Ezê bi kurtayî çend notan jê bigirim.

Em bibînin ka bê feylezofe me ci gotiye. "Rêberên mîna Seyîd Ubeydullah Nehîr, Mîr Bedirxan, Şêx Mehîmûdê Berzencî, Mele Mistefa Berzanî, Seyîd Abdulqadir û Şêx Seîd Paloyî di têkoşîna gelê kurd de... bi qasî nasnameya xwe ya milî, bi nasnameya xwe ya olî jî hatine nasîn... wesfê wan i serwer, oldariya wan e..."




Sardir sermadir

Li Şemrexâ Çiyayê Mazî, mirovek bi navê Biroyê Hemkê Bedo heye, (Her hebe mirovekî hêja ye). Dema dibistana pêşî, rojekê bi derengî diçê dibistanê. Mamosteyê wî jê dipirse:

– Tu çima dereng hatî?
Biro wiha bersivê dide:
– Mamoste, sardir sermadir. Şorba sibê germdir. Heta Henikê danî û ben xwardir. Û heta ben geldî Evdolko zîl çaldî. Ne bela min dir.

ÇIYA MAZÎ

XELAT...



Bersiva Xaçepirsê (7)


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 9'an kaseta

Koma Azad
“Şemal” e.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn “Peyva Veşarı” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînîn.

Kesênu xelata xaçepirsa 7'an kitêba Reşidê Kurd “Ez” qezenc kirine: Yasemin Dora/Adana, M. Uyanık/D.bakır, Sadık Ekinci/Şanlıurfa, A. Haydar Aşkın/İzmir, Berîvan Ayaz/D.bakır, Çeko Yılmaz/Batman, Ömer İlhan/Mardin, Nezir Gelmez/Mardin, Müzzen Elçiçek/İzmir, Abdullah Akalay/Batman

XAÇEPIRSA BIXELAT (9)



PEYVA VEŞARI



1 2 3 4 5 6

Îfadeya dijwar Û dardekirin

Omerî Malbatâ Keleş, bi zanebûna zimanê tirkî li herêma Omeriya, nav dabû. Gundênu ku lê dihêwirîn, tim û tim keyati para wan bû. Dema ku ji malbatêni bîhêz dipirsin: “Bona ci sedemê we mixtarî (keyati) winda kir?” Digotin: “Wele ev malbatâ Keleş bi tirkiya xwe keyatiya gund ji me standin. Kuro, ew bi tirkî mîna bilbil in.” Di sala 1954'an de hilbijartimek li Tirkîyeyê pêk tê; di navbera Partiya Komar a Gel û Partiya Demokrat de. Li herêma Omeriyen, beşa Etmankî di Partiya Demokrat de, beşa Mehmûtkî jî di Partiya Komar a Gel de cih girtibûn.

Roja hilbijartinê, li gundê Xirbêbelikê, li ser sindoqa dengan, di navbera mirôvîn Etmankî û Mehmûtkî de pevcûn derdikeye. Ehmedê Mihemed Can (mirovekî Etmankî) ji CHP'ê (ji Mehmûtkîyan) bi navê “Etman, Hesen û Tahir” sê mirovan dikuje û direve.

Piştî salekê tê girtin. Mahkeme dibe. Dibêje, “Haya min jê nîn e. Ez li binxetê bûm. Berî ku ez bême girtin, bi du rojan ez derketibûm serxetê û hatim girtin.” Li ser vê yekê heyeta daghehê bîryara keşfê

dide. Têne gund. Li dîtyaran (şahidan) digerin. Ji ber ku kesekî bi tirkî bizanibe tune bû, keyayê gund Evdê Mala Keleş dibe dîyar.

Dadger jê dipirse: “Li ser bext, dîn û îmana te, tuyê ya rast bibêji. Ka bûyer çawa bûbû?” Evdo bi tirkî dibêje: “Min Ehmedê Apê Mihemed Can dît ku tiving di dest wî de bû û min dît on bêş tene mermî vûrdi. Teq teq teq... On bêş tene mermî vûrî. Kirîvê min Etman û Hesenê Apê Omer oldurdî. Û serê min di bin kevir de bû. Biz gormedî. Hakim beg, wele tele bile serê min di bin kevir de bû, biz gormedî. Û ji min pê ve jî şahid mahid yoxtir.”

Piştî ku heyeta dedgehê ji gund derkev; gundi gişt li Koya Evdo dicivin û dibêjin: “Selî elâ Mûhemmed! Ew ci ifadeyeke dijwar bû, wele me kesê weha şatir û jêhatî û bi tirkî wekî bilbil ne dîtbû û ne bihîstibû. Bi kêmâyî Ehmedê Mihemed Can dê sed sal ceza bixwe. Dibe ku wî bi dar de jî bikin.” Lî Ehmedê Mihemed Can bi wê ifada keya, ya çewto mewto, rojek ceza nexwar, hate berdan.

î. OMERİ

XAÇEPIRSA





Yaşar Kemal
ji ber nivîsa
xwe ya bi
navê
"Zilame te
zedê bibe" 20
meh ceza
stand.

A. CICEK

Qedehek av, dijminatiya dîn û xayîntî

Destpêk rûpel: 13 (quncik)

i gorî nivîskar, ji ber vê ye ku kurd, piştgiriya partiyen ku olê derdixin pêş, bêhtir dikin. M. Metiner dibêje, yênu ku polîtikayê li ser nasnameya kurd dikin, hurmetê ji dînê kurdan re nîşan nadin û êrîşbirina ser dîn ji xwe re kirine armanceke îdeolojîk. Ji ber vê ye ku ew ketine tengaviyê. Mihemed dixwaze "herkes gunehêne kesen laîkperest û rewşenbirên ateist bibîne." Paşê nivîskarê me tê ser qedeheva avê û dibêje "Ev neyariya dîn e. An jî nezaniya polîtikayê ye." Paşê şîretekê li me dike, dibêje Tansu Çiller tim û tim qala beyraq û azanê dike. Li gor wî yênu ku nizanbin bi vî awayî polîtikayê bikin, bila dev ji polîtikayê berdin.

Li ser hilbijartinan jî fetvayekê dide û dibêje sedemên serneketina hilbijartinê, pesindayîna sosyalîzmê ye. Ew bawer dike pêwistiya kurdan ji sosyalîzmê re tune ye, daxwaza jiyandina sosyalîzmê ji kurdan re bêwate ye. Mihemedê me dev diavêje serokatiya kurdan: "Di tevgera kurdan de tro krîza nûneriyê heye." Hûn dizanin çîma? Ji ber ku di vîtrîna kurdan de "şaxê oldaran" nîn e. Birêvebir û rewşenbirên kurd, laîkperest û çepgir jî seqamekê ji Mihemed dixwin. Li gor wî ev hemû mîna "Jaqobenê Fransiz û kemalîstên tîrkan in." Mihemed ji êrîşen heta vira têr nabe, kezeba wî hênik nabe, êdî dixwaze derba mirinê li rewşenbir, laîk, ateist, sosyalîst, rîvebir û serokatiya

kurdan bixe. Bala xwe bidinê ku ci dibêje: "Yênu ku li xayînen kurdan tenê di nav sîstema cerdevaniyê de digerin, bi min xelet in. Esil xayînen kurdan ew kes in ku dixwazin dînê wî, baweriya wî, orf û ade-tên wî bi zorê biguherînin."

Di nav kurdan de, ji yên ku ji bejna xwe bilindir gotinan dîkin û bêhawê êrîş dîbin ser der û dora xwe re dibêjin: "Hêdî bajo siwaro, hêdî bajo!" Mihemedê me jî li hespa xwe siwar bûye, şûr di dest de wekî hêçtirê hêçbûyî êrîşê dibe ser herkesî.

Di dawîya nivîsa xwe de Mihemed dibe demokrat, dibêje "Tevgera kurd, divê ne tevgereke îdeolojîk be, divê eniyeke dorfîreh û demokratîk be. Divê hemû mirov di nav vê tevgerê de nasnameya xwe bibînin, lê divê hema tu kes nasnameyekê, bi yênu din nede qebûlkirin." Çiqas baş dibêje, çiqas demokrat difikire. Bi van gotinan piçekî bêhna mirov fireh dibe.

Belê ecele nekin, nivîskarê hêja poşman dibe. Mihemedê me yê oldar û demokrat ji bo eniya dorfîreh û demokrat şertekî datîne: "Divê hêmanen vê tevgerê, ne sosyalîzm û laîkperest bin" Lê ci be? Ma bila tevgerek, bes ji her şaxê îslamê be? Li gor wî gelê kurd bi awayekî vekirî tercîha xwe diyar kiriye. Bi ci awayî tercîha xwe diyar kiriye, hûn dizanin? Gelê kurd di hilbijartinan de dengê xwe dane partiyeke îslamî û partiyeke millî. Anglo Partiya Refahê û HADEP'ê.

Birayê Mihemed! Tu dixwazî kê

bixapînî? Ew mirovên ku tu êrîşî wan dikî, ne wekî endamên partiya ku tu ji nav wan hatîyî bê mantiq in. Ew her gotinê, her gavê yek bi yek dipîvin û diparzinin. Ew dizanin rastî û çewtiyê ji hevûdu derînin. Baweriya wan bi "teblîxên" çewt nayê. Li mantiq digerin û ew êdî bûne pisporêni mirovan. Ji ber ku gelek mirovên mîna te, ku li tu iştasyonan bi cih nebûne, hatine û çûne.

Hewce nîn e ku em nivîsa te dirêj dirêj rexne bikin. Ji ber ku her xwendevan çewti ya mantiqâ te dibîne û fêm dike ku di dilê te de ci "gir" heye. Ku ne wisa be, ji bo qedehek av mirov ev şoran dike?

Dîsa jî dixwazim bala te bikşînim ser çend rastiyân.

1- Te, navê çend mezinên kurdan daye. Em spasiyên xwe ji wan re nîşan didin. Ew rûspîtiyên me ne. Navê wan di dilê me de ne û ew rîberên me ne.

Belê tu çîma qala Feqiyê Teyran, Cegerxwîn, Musa Anter û Kawayen hemdem naki? Tu çîma qala Seyîd Riza yê Dêrsimî, Elîşêr naki? Ma qey ew ne rîberên kurdan in?

2- Tu çîma nabînî ku bi milyonan kurdan alewî hene ku xwîna xwe dirêjin û ramanen wan ne wekî yêne te ne?

3- Kurdên Zerdûşti di têkoşîna neteweyî de qet bala te nekişandine?

4- Tu çawa nizanî ji rûnîştanen Kurdistanê, wekî ermenî, asûrî û kel-daniyan ji te bêhtir li hemberî dagirkiriyê radibin?

5- Ez bawer im ku tu dizanî di nav

cerdevanan de, tu kesen demokrat, laîk, ateist û sosyalîst jî nîn in. Belê oldarê mîna te bi hezaran in.

6- Bila tu bizanibî misilmanen kurd yê rastîn bi laîkperest (!) û ateistân re dimeşin û qedr û qîmeta hev û din dizanin. Di meha Remezanê de laîk, secadeya birayen xwe yê misilman radixin û misilmanen rastîn jî di meha Remezanê de cixareya birayen xwe yê laîk pê dixin.

7- Tu baş dizanî ku di hilbijartinan de yênu ku dirûşmeyen "bijî sosyalîzm" diqîrin, ne endamên partiya me bûn. Ew şîrîkîn me yê hilbijartînê bûn.

8- Ez dizanim rojnameya Azadiya Welat ne bi ramanen te re ye û ew ji te re nabêjin "cerdevan" di ser de jî nivîsa te diweşîn. Gelo te tu ders ji vê demokrasiyê girt an na?

Ev hezar sal in ku misilmanen mîna te (ci kurd û ci biyan) li ser navê îslamê gelê kurd xapandise. Sedema ku gelê kurd ketine vê rewşê ne laîk û sosyalîst in. Oldarê sextekar û nezan in.

Ku tu misilmanekî bi bawer bûya, te ji min re nedigot: "Tu ji polîtikaya Tansu Çillerê dersê bistîne." Tu çawa jî min re dikaî bîbîjî tu ne bi rojî bî jî, wekî kesen bi rojî hereket bike. Xapandin, di kîjan felsefeyê de wekî dirustiyê tê qebûlkirin.

Dûv re kî ji te re gotiye, em dixwazin dînê kurdan biguherînin. Me kengî êrîş biriye ser "dînê kurdan".

Bira, te konê xwe li nava zeviyeke şîl danî. Ji xwe re li riyeke din binêre!

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ
Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu): SAMÎ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMÎ BATUR
Berpirsê Karê Nivisaran (Yazi İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ
Berpirsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navîşan (Adres): Ayhan İşık Sok. No:23/3 Beyoğlu-İstanbul
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19
Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

E m ji aliyê Yêlo E bûn lê...

Em, ên ku hînî pevçûn û lihevxitinê bûbûn, dema me li filmên Yêlo temaşe dikir, hewiya (sebra) me nedihat. Film tev bi axaftinê derbas dibû. Hem jî bi tirkî bû. Ev jî sedemek bû. Carinan, gava hin kes bi devçenkê diçûne hev û galegal dikirin, gel ew rewş wiha şirove dikir: "Eynî wekî tirkan in, bêxîret dest nabine xwe."

Pêşî di jîna me de çîrok hebûn. Bi wan re jî lehengên wan. Me bi wan lehengan kurmên xwe dişkandin. Wan ne bi tenê xewn û xeyalên me dikemilandin, her wisa leyistikên me jî bi wan dixemilîn. Ne me sînema dizanibû û ne jî televizyon. Em ji wan bêhay dijîyan. Werza me sax bi wan dibihurî.

Heye ku hûn bipirsin û bibêjin, "Kî bûn ew leheng?" Ew ji Rostemê Zal heta bi Mîrza Mihemed bûn. Ên din jî hebûn, wekî Siyabendê Silivî, Memê Alan, Hesik... Lê, yêñ ku em têr dikirin ên din bûn. Çima? Ji ber ku ew her di şer û cengan de bûn û kesî zora wan nedibir. Na na, kesî zora me nedibir. Ji bo ku "leheng" ên jîna rastîn em bûn. Bi mîranî û wêrekiya wan, em şad dibûn. Piştî ku çîrok diqedîya, îcar me dest pê dikir.

Lê, sînemayê ew ji me standin. Yilmaz Güney û Cüneyt Arkin ketin şuna wan. Wan deman, salêñ piştî heftîyan, li gorî devokê farqîniyan em sengele û xort êdî bûbûn du ber. Bera ji aliyê Yêlo û ya ji aliyê Cino. Her du lehengen, sînemayê, hîç nedidurîvîn hev. Yêlo, ne bedew bû û hem jî (ji bilî filmên wî yêñ destpêkê) di filmên xwe de ew çend ne jêhatî bû. Cino jî bedew bû û hem jî çeleng û jêhatîbû. Gava şûrê xwe ji kalan dikişand û dadiweşande dijiminên xwe, bi dehan peya ji berê dipekiyan. Hîna destê xwe baş bilind nedikir, dijimin û neyarê wî li erdê, li berê pîj dibûn.

Hûn dikarin bibêjin, "Nexwe wisa bû, çîma berekê xwe diavête pişta Yêlo?" Sedem ev bû:

Yêlo kurd bû, ji aliyê xizanan, gundi û rîncberan bû. Ji aliyê karker û cotkaran bû. Ew bi xwe jî, ne zengîn bû ne jî lawê zengînan bû.

Cino ne wisa bû. Ew dewlemend bû. Li hemberî fîkr û ramanen Yêlo

bû. Wî di filmên nijadperest de dileyiş, ên li ser osmanîyan. Doza tirkîtiyê dikir. Ma bedewbûna wî jî, ne şanê zengînbûne bû? Ma ew ne kurê wan bû? Ma ew ne tirkî paşverû bû? Ma em û ew ne dijminen hev bû?

Wan her du ber, qet ji hev hez nedikirin. Li hev dixistin. Ên ku ji aliyê Cino bûn, bi qaydeyî wî dikirin. Liv û tevgeren wî hîn dibûn û ew pêk dianîn. Yêloyî jî, ji filmên wî hînî ramanan dibûn. Lê hin kesen ku ji bera Yêlo bûn, bi vê yekê qîma xwe nedianîn. Ji teperepê, ji gurmegurmê hez dikirin. Hûn dizanîn, Yêlo ji çekê (sîleh) pir hez dikir. Di hin filmên xwe yêñ destpêkê de, bi demançeya xwe berî nîşangeh dida û ew dihingaftin jî. Hin kesen ku ji bera wî bûn, ev xuya wî ji xwe re jî kiribûn adet. Li nav baxçeyen tenha, wan jî, şûse ji xwe re dikirin armanc. Dev ji hingaftina derziyê berdabûn û dest avetibûn şûşeyan.

Em, ên ku hînî pevçûn û lihevxitinê bûbûn, dema me li filmên Yêlo temaşe dikir, hewiya (sebra) me nedihat. Film tev bi a x a f t i n ê derbas dibû. Hem jî bi tirkî bû. Ev jî sede-

mek bû. Carinan, gava hin kes bi devçenkê diçûne hev û galegal dikirin, gel ew rewş wiha şirove dikir: "Eynî wekî tirkan in, bêxîret dest nabine xwe."

Xort û sengele, di civaka me de wişa ranedibûn. Gotin û nîqaş, li hemberî qirêñ û pevçûnê ter tim di rewşekê têkçûyî de bûn. Çaxa yekî ji yekî re gotineke tehl bigota, tavilê kulmek bi

yê din ve da-
t a n i .


Kesî

ne gotin û ne jî çêr danedixwarin. Pîvana mîranî û jêhatîbûnê, ne jîrbûn bû. Belê em ji civakeke şidethêz radi-bûn. Xirecir, karê jinan bû. Mîr ew bû ku di binê gotinê de nedima.

Rewşâ me hemû Yêloyiyan, hema bibêje wiha bû. Her çiqas em bi dev ji aliyê wî bûn jî, lê bi dilê xwe, bi awayekî veşarî em "hezkiriyen Cino" bûn. Ji ber ku wî bi wê "jêhatîbûn û şipil-bûn" a xwe, dilê me rihet dikir. Carinan em Yêloyî di nav xwe de me li ser vê rewşê bi hev re munaqeşê jî dikir. Me digote hev: "Lawo di filmên Yêlo de qet şer nîn e, hema ew bi hev re xeber didin. Cino gava şer dike dile me di wan "neyaran" de rihet dike."

Heta em bi vê yekê nediman. Me ew her du leheng didan ber hev jî. Gelo kî bi kî dikaribû? Li ser wê mijarê jî em diketin qirika hev. Me qirik û gewri li hev ziwa dikir. Me ji bera din re digot ku Yêlo bi Cino dikare. Çawa? Ma ew birîna li çena Cino bi kulma Yêlo çenebûbû?

ZANA FARQÎN



Yılmaz Güney